**Dilawerê Zengî**

# QÎRÎNA MIRINÊ

## ”Zo çû, Lo ma!”

Qîrîna Mirinê ..................................................................1

**Mafên çapkirin û belavkirinê parastî ne**

Navê pirtûkê: Qîrîna Mirinê

"Zo çû, Lo ma!"

Nivîskar: Dilawerê Zengî

Pêşgotin: Dilovanê Deştê

Tîprêz: Şengo Dumilî

Tablo: Şêwekar Siwar Qermûtî

Berge: Bavê Pêla

Çapa yekemîn: Qamişlo, 2019

Çapa duyemîn Qamişlo 2021

Çapxana: Pêla

## Diyarî

Ji bo wê xanima ku bi dilbînî û mihra xwe piştgiriya min kiriye, ku ez vê pirtûka xwe bi dawî bînim. Ji bo Gula baxê dilê min, rêzdara hêja û delal hevjîna min **Gulistan xanim Emîn** re pêşkêş dikim.

**Dilawerê Zengî**

**Qamişlo 2019**

Qîrîna Mirinê ......................................................................4

# Pêşgotin

Kurdistan (xaka Kurdan), ser'erd û bin'erd, welatekî pir zengîn û dewlemend e. Ji hezaran sal ve, Kurd li ser çiyayên welatê xwe jiyana xwe derbas kirine. Lê, mixabin ku seranserî dîroka xwe ew rastî zordarî, setemkarî, dagîrkirin, ... çi ji aliyê miletên hevsînor bi alîkariya dewletên berjewendîperest, û çi ji wan dewletan bi xwe ve, hatine.

Dîsa mixabın ku, ev dewlemendiya welatê Kurdan bûye sedemeke sereke û bingehîn hem ji çavtengiya milet û welatên nêzîk û hevsînor re, hem jî ji çavbirçîtî û çavberdana welatên xwedî hêz re. Herwiha, van herdu aliyan pir her û her pîlanên genî û kirêt dihûnan ne tenê jibo bindestkirin û dagîrkirina vî welatî û nîvwinda-kirina dîroka miletê Kurd jî. Di vê pirtûka bi navnîşana  "Qîrîna Mirinê" de, nivîskar Dilawerê Zengî baş li ser qonaxeke girîng ji vê dîrokê

radiwestê, û bi şêweyekî hêsan bûyeran şirove dikê û wan bi hev ve girê didê.

Berî xwendina naveroka pirtûkê, pêdivî bi naskirina danerê wê bi xwe û kurtejıya wî heye. Dilawerê Zengî kî ye? Rola wî di pêşxistina çand û wêjeya Kurdî çi ye? Kengî dest pê kiriye?

Navê wî Brahîm kurê İsma'îl kurê Mihemedê 'Emê û Ferîda Eliyê Heskê (Dayka Şehîdan) ye. Gorbuhiştê nemir Seydayê Tîrêj ev nasnav (Dilawer) jê re bijartiye û wî jî pejirandiye. Malbata Dilawer serweriya Êla xwe (Dumilî) dikirin. Lê, ji ber encamên şerê di navbera Rûsiya Qeyserî û Osmaniyan de, ji gundê xwe koçber dibin, û qonax bi qonax mişextiya wan berdewam dikê ta digihine gundê Amûdê. Sal derbas dibin, dê û bavê Dilawer li Amûdê koça dawî dikin û giyanên xwe yên pîroz disipêrin Xwedayê xwe. Piştî mirina bavê xwe, û di temenê 19 salî de, û bi mebesta peydakirina kar, Dilawer berê xwe didê bajarê Şam.

Di destêka jiyana xwe de, Dilawerê Zengî li ber destê Şêx Sedredînê Bavê Kal hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî dibê. Di pey Şêxê nemir re, herdu helbestvan û wêjevanên welat-perwer û bejinbilind nemir Seydayê Cigerxwîn û gorbuhişt Seydayê Tîrîj roleke xuya û li ber çav li pêvajoya jiyana wî dikin. Ev jî bû bingeheke asê ji siberoja wî re. Piştî çûna wî ber ye Şamê, ev bingeha zimanhezî û vîna xwepêşxistina rewşenbîrî xurtir û geştir dibê. Ev yek jî ne xweber hate bidestxistin. Naskirina gorbuhiştê gewre Apê Osman Sebrî û civat û hevdîtınên rojane pê re bûne têved ku ew jî bi dilekî geş û coşeke bilind û xweş di nav bax û bîstanên ziman, çand û wêjeya Kurdî dûr herê. Lêbelê, bi dîtin û naskirina Rewşen xanim Bedir-Xan, û seredan û çûnûhatinên wî yên heftiyane û guhdana wî bi rewşa yadê Rewşen baweriyek xurt di navbera wan de çê bû. Herwiha, ev bawerî bû têved ku Rewşen Xanim deriyê gencîneya rewşenbîrî ya Bedirxaniyan, nemaze

şûnmayên girêdayî bi çand û dîroka Kurdewarî ya nemir Celadet Bedirxan jê re vekê.

Bi vî awayî, û dibin bandora van lehengan de, Dilawer bêhtirê dema xwe bi xwendinê û nivîsandinê re derbas dikir, nemaze di warê dîrok, wêje, helbest û zimanê Kurdî de. Di nav derbasbûna salan de, Dilawer gelek gotar, helbest, kurteçîrok û pirtûk nivîsîne. Hejmareke baş ji pirtûkên girêdayî bi kultûr, çand û zimanê Kurdî ve jî wergerandine.

Hêjayî gotinê ye ku, berhemên wî yên nirxbilind di warên rengereng de, bêhtir ji 40 pirtûkî ne, rola ku Dilawerê Zengî di pêşxistina çand, û zengînkirina pirtûkxaneya Kurdî zelal dikin. "Qîrîna Mirinê" yek ji berhemên wî yên dîrokî ye.

Di vê pirtûkê de, nivîskar Dilawerê Zengî, ev qonax kiriye 3 beş: Berî Şerê Yekemîn yê Cîhanê, salên berdewamiya şer û salên piştî şer re û encamên dema berî. Di dawiyê de, wî jibîr

nekiriye ku li ser bandora nakokiyên navdewletî û Şerê Cîhanê yê Yekemîn li ser Kurd û Kurdistanê rawestê û nerînên xwe jî zelal bikê. daner ji sadsala 19ê û geşbûn û bilindbûna hestên neteweyî di Ewropayê de, dest pê dikê. Ew hestên ku bûne sedemên nakokî û şer di nav dewletan de. Di encamê de, dubendî di navbera welatên Ewropayê de çêbû. Ji aliyekî ve, Fransa, Rûsiya, İtaliye û Brîtaniya hevbendiyek bi hev re avakirin. Ji aliyê din ve, Elmaniya, Nemsa û İmperatoriya Osmanî girêbendeke sêqolî girêdan.

Danerê pirtûkê ji van zanyarî û têgehên bingehîn dest pê dikê û sedemên vêketina Şerê Yekemîn yê Cîhanê baş zelal dikê. Ji vê bi şûn de, ew bi berfirehî li ser vî şerî û encamên wî rawestaye. Ew encamên ku dewletinen nû avakirin, hinên kevin biçûk û parçekirin. Ev kar tev bi riya hevpeymanan di nav xwe de saz kirin, û şêweyinên desthilatdarî û rêveberiyê nû peyda kirin da ku karibin mêtingehên xwe berferehtir bikin û wan li berjewendiyên xwe bi rêve bibin.

Derbarê dîroka netewa Kurd û welatê wî Kurdistan de û rewşên ku tê re derbasbûne, daner ji yekemîn parçebûna Kurdistanê di navbera Sefewiyan û Osmaıyan de, di sala 1514z li Çaldêranê dest pê dikê; û di serhildan û şoreşên Kurdî re ta şoreşa Şêx Se'îdê Pîran berdewam dikê. Kongir, civat û peyman û girêbendên ku dihatine girêdan ji salên Şerê Cîhanê yê Yekemîn ta kongirê London û peymanê Sêfer û Lozanê, cihekî baş di pirtûkê de wergirtine. Parçekirina Kurdistanê li gor girêbenda Sayks-Pîko, binpêkirina peymana Sêferê û imzekirina peymana Lozanê, û sedemên jınavbirina mafên netewa Kurd cihê rawestanake taybet in di pirtûkê de. Bi vê û wê re jî, sedemên têkçûna mîrnişîniyên Kurdî û nedewletbûna wan li gor bîr û baweriyên daner, hatine şirovekirin.

Pilanên Tirkan û hevbendên wê tûj û dijwar jibo dijminatiyê di nav Kurd Ermenan de peyda bikin, her berdewam dibûn, nexasim Ermenê Taşnaq ku tunekirina netewa Kurd ji xwe re

kiribûn armanca sereke. Wan bi alîkariya Tirkan, û carina jî bi çavjêgirtina Rûsan, bi hezaran Kurd koçber bûn, û bi deh-hezaran jî kuştin.

Dilawerê Zengî di pirtûkê de cihekî girîng û balkêş daye damezirandina "Komela Xoybûn" û têkarkirina wê di pêvajoya tekoşîna neteweperwerî ya netewa Kurd de. Armanc sedemê damezirandinê jî baş di pirtûkê de têne şirovekirin. Jibîr nebûye ku damezirênerên "Xoybûn" bêne bibîranîn û navên wan bi xêzinen zêrîn di pirtûkê de bêne nivîsîn.

Dilawerê Zengî di serencama pirtûka xwe de wiha dibêjê:

" Şerê Cîhanê yê Yekemîn 1914-1918an bi bûyer û guhertinên xwe yên giring, qûnaxeke pêwîst û diyar di dîroka gelê Kurd de, pêk anî. Rewşa wî jî ne kêmtirî rewşa hemû miletên cîhanê bû.... Serxak û binxaka Kurdistanê yek ji sedemên vêxistina Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû. Rûsiya, Brîtaniya, Elmaniya û Frensa dixwestin

cihekî xwe di nav gelê Kurd de çê kin. Her yek ji wan xwedî tewir û şêweyekî li gorî nîr, derfet û rajeya xwe bû."

**Dilovanê Deştê**

## Ewropa Berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn:

Berî her şer û pevçûnekê, sedemên wê hene. Çi sedemên penahî bin û çi yên rasterast bin, tev dibin mîna ardû û komirê ji wê pevçûnê re. Nemaze ko tu çareserî ji wan re neyên dîtin, wê ew êş bibe mîna kiwînêrên ko di canê mirovî de der tên, û êdî derman nema tu çarê dike. Piştî mirov êş û derdan dikişîne, nih mirov lê haydar dibe. Ev jî serê sedeman e. Kurdan berê gotiye: " Av di golan de genî dibe". De werin em bi hev re dest bi mijara xwe bikin. Mijara me li ser Şerê Cîhanê yê Yekemîn e. Di serî de, emê li ser rewşa berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn dagerin û bi kurtî ravebikin.

Di babilîska nozdehan de, di nav Ewropiyan de, hestê neteweyî geş û xurt dibû, kêferat û berberiyeke mezin  di nav wan de çê dibû. Her

kesî li neteweya xwe dipirsî, ji her kesî dihat xwestin ku li xak û welatê xwe xwedî derkeve. Bayê mafê çarenûsê, azadî û serxwebûnê, roj bi roj, gûrtir û xurtir dibû. Li nav Ewropiyan, ev rewşa nuh, weha nedima, belê bi xwe re şer, nakokî û dijayetî peyda dikirin. Bi taybetî li herêma Belqanê, ew herêma ko bi pir-rengî û pirnetewî naskirî ye, û tevlîhev û girêkotkî ye, mîna volqanekê hemahema li ber teqînê ye. Dewletên Ewropî li hemberî hev sekinîn û li peyman, girêbendî, hevkarî û têkiliyên xwe vegeriyan û dan riwê hev. Gelek ji dewletên Ewropî destên xwe dirêjî dewletên li pişt derya jî kiribûn û ew xistibûn bin destên xwe. Ango, dewletên Ewropî dagîrker bûn. Ev berberî û nakokiyên di nav dewletên Ewropiyan de pirtir zelal dibûn, nemaze di warê rewşa aborî de, ya ko ji tevan re kul û xemeke giran bû; peydakirina sûk û bazaran ji bazirganiya xwe re. Ev jî bû sedemê geşkirina agirê şer.

Di şerê sala 1870î de, Ferensiz li hemberî Elman şikestin. Ferensiz li pey tol û heyfa xwe ketin. Ramyariya girêbendî û hevbenda li dij, rewşa Ewropayê pir li hev xist. Girêbenda sêqolî ya qeyseran (Elmaniya, Nemsa û Ûris= Rûsiyayê) bû. Dijîtî û nakokiya li ser herêma Belqanê di navbera Nemsayê û Rûsiyayê de hişt ko Ûris ji wê hevbendiyê derkeve. Fransa xwe gihand Rûsiya û herdiwan bi Brîtaniyayê û Îtalyayê re hevbendiyek bi navê (Dewletên Hevbend) avakirin. Li hêleke din, di navbera (Elmanyayê, Nemsayê û Imperatoriya Osmanî) de, girêbenda dewletên navend /Sêqolî/ hate sazkirin.

Di 28/6/1914an de, kuştina cihşînê textê kişwerê Nemsayê (Franz Ferdînand) li ser destê (Serb)an, bû sedema rasterast û yê sereke ji bo vêxistina Şerê Cîhanê yê Yekemîn.

## Şerê Cîhanê yê Yekemîn:

Piştî şerên Belqanê, dewletên Ewropayê di navbera xwe de, bûne du beş. Dewletên: Ingilîz, frensiz, Ûris û Îtaliyayê, di beşê ('Itilaf) de cih girtibûn. Dewletên: Elmaniyayê, Awusturayê û Macaristanê jî, di beşê ('Ittifak) de cih girtibûn. Ew berberî û keftelefta dewletên dagîrker gasîna şerê wan roj bi roj firehtir dikir. Şerê di nav Ewropiyan de, bû şerê cîhanê, û tu kes ji wî şerî û wê cengê reha nebû. Di destpêka vî şerî de, Împeratoriya Osmanî bê alî bû, û beşdarî di şer de nekir. Jiber vê yekê, di Tebaxa 1914an de, ew şer bû şerê Dewletên Ewropayê. Lê, hikûmeta Osmanî ket gumanan ku şerê dewletên Ewropayê wê xwe bigehîne Rojhelata Navîn û kaniyên petrolê jî têxin bin çavdêriya xwe; herweha, dê bi hêsanî jî karibin xwe bigehînin Rojhelata Deryaya Sipî û Rojhelata dûr.

Bêdiro, parçekirina împeratoriyê jî wê zûtir bê cih. Hikûmeta Osmanî bi Elmanyayê re têkilî

danî û li ser mercên ku Împaratoriya Osmanî têkeve şer li hev kirin.

Ev şerê cîhanî li dora çar salan /1914-1918/ dirêj kir. Di vî şerî de, tiştê balkêş ew bû ku, gelek çekên nuh mîna tang, top, noqar, vapor, balafir û kozik û çeper hatin bikaranîn. Şerê Cîhanê yê Yekemîn di du qûnaxan re derbas bû:

**Qûnaxa yekemîn** (1914-1917): Bi serketina dewletên Hevbenda Navend /Sêqolî/ bi serkêşiya Elmanan.

**Qûnaxa diwemîn** (1917-1918): Vekişandina Ûris, piştî serketina şoreşa Belşevî û derbasbûna Emêrîkan şer û radestiya Elmanan.

## Şerê Ewropayê:

Şerê Ewropayê ji sala (1914-1916)an di du qûnaxên şer re derbas bûye. Qûnaxa yekemîn jê re digotin: Şerê Bizavan. Qûnaxa diwemîn jê re digotin: Şerê Kozikan.

### Şerê Bizavan:

Şerê Bizavan, ev navlêkirin ne jiber xwe ve hatiye. Belê, jiber tevgerên supah û leşkerî yên bi lez û bez li ser hemû eniyên şer û biserketina Girêbenda Sêqolî ya bi serkêşiya Elmanan hatiye gotin. Lê, Dewletên Hevbend êdî dikaribûn bi lez û bez li pêş serkeftinên wan rawestin, û piştî şerinên giran û bi taybetî di şerê (Firdan) û şerê (Som)ê de, li Fransayê di sala 1916-an de xweş biser dikevin.

### Şerê Kozikan:

Li ser eniya Rojava û Rûsiyayê, şer di cihê xwe de, hêdî hêdî xwe bi pêdarî radigirt. Leşkerên li herdû aliyên şer, li hemberî hev

disekinîn, û dest bi kolandina kozik û avakirina çeperan dikirin. Lewra,, jê re "Şerê Kozikan" hate gotin. Li hemberî hev, çekên nuh mîna tang û balafiran bikaranîn. Hin dewletên din derbasî şer bûn; mîna Îtaliya û dewleta Osmanî. Şerê Ewropayê bû şerê cîhanê bi tevayî.

## Şer di Sala 1915-an de:

Di sala 1915-an de, li gelek cihên şer, Elmanan dikaribûn biserkevin, û zora dewletên hevbend bibin. Di sala 1915-an de, di meha gulanê/mayo de, di şerê Corlîs de, Tarnawo zora Ûris  birin û Polenda û tevaya bajarên Litwaniya xistin bin destên xwe, û piraniya riyên ragihandin û têkiliyan, di nav leşkerên Ûris de qutkirin. Ev bû sedemê ku li dora (325) hezar ji Ûrisan dîl û giriftar bibin. Bi vê yekê, ne tenê pişta Ûris şikest û pir ziyan giha hêza wê, belê Belqanê jî stiwê xwe ramidand, û çemê (Danûbê) derbaskir, û êrîşeke dijwar da (Serb) û ew tarûmar kirin. Di vê salê de, û li gelek eniyên şer Elman pir serdiketin û li gelek eniyan li hemberî êrîşên leşkerên Fransa û Brîtaniyayê  xwe bi pêdarî radigirt.

Qîrîna Mirinê ..........................................................22

## Şer di Sala 1916an de:

Di vê salê de, du şerên herî mezin, li ser axa Fransa çê bûn. Yek jê heft mehan, û yê dî çar mehan dirêj kirin; ew jî ev in: Şerê Firdan û Som in. Di şerê Firdan de, Elman (240) hezar mirî û birîndar ziyan kirin. Lê, Frensiz (275) hezar. Di şerê (Som) de, Elman lawaz bû û xwe li ber hêzên Dewletên Hevbend negirt, û li dora sed mîlê çarkuç paş ve vegeriya. Di vî şerî de, Elman supahên xwe yên kevnare tev winda kirin. Vêca ji neçarî barên xwe dan ser milê leşkerên ciwan û nûhatî. Di vî şerî de, hêzên Brîtanî şêst hezar kuştî û birîndar di yek rojê de danîn. Diyar e, cara yekemîn e ko tang di şer de hatiye bikaranîn. Bi serkêşiya serbaz Brosîlof, Ûris êrîşî Nemsayê kir û (450) hezar ji leşkerên wan û Mecer dîl girtin. Vê serkeftinê hişt Romanya jî êrîşî Nemsayê û Mecerê bike. Lê, Elman nehişt û li wan xist. Di şeş heftiyan de, Elman derbasî Boxaristê bûn.

**Şerê Noqaran û Emêrîkan:**

Di sala 1916an de, şerekî deryayî di derya başûr de, di navbera ustûlê Elmanan û Ingilîzan de çê bû. Ew şer, bi navê Catland hate naskirin. Elmaniya êrîşî ustûlê ingilîzan kir, bi hêviya ko dorpêça deryayî li dor xwe bişkîne, û Brîtaniya birçî û lawaz bike. Elmaniya dest bi şerê hemî noqar û keştên li nav derya kir. Bê sînor - çep û rast- li keştên bazirganiyê jî da û ew noq kirin. Vî kar û bûyerî Emêrîka rakir ser tapana û hişt ko bibe sedemê Emêrîkanî di meha Nîsana/Ibrîl 1917an de derbasî şer bibin. Nemaze piştî Emêrîkanan bihîst ko Elman soz bi dana sê wîlayatên ji axa wê dane Meksîkan.

Dewletên Hevbend pir sûde ji hêz û xurtiya Emêrîkanan wergirtin, û bi taybetî werîs li gerdena Elmanan teng kirin, û ew lawaz kirin.

**Guhertina Şopa Şer di Sala 1917an de:**

Di riya derya re, dewletên hevbend êrîşî dewletên girêbenda sêqolî ya dewletên navendî kirin, û ew dorpêç kirin. Armanca vê êrîşê ew bû ko ji hêlekê ve, di riya derya re wan dorpêç bikin; û ji hêla dî ve, şerê aboriya wan bikin. Lê, Elman bi xurtî li wan vegeriyan û êrîş birin ser hemî noqar, vapor, qeyikên şer, û ta li yên bêlayen jî xistin. Sedem jê ko ew qeyik û gemî negihên Brîtaniyayê. Ji nav wan qeyik û gemiyên ko noq kirin çend ji wan yên Emêrîkanan bûn. Jiber vê sedemê Emêrîka derbasî şer dibe û cihê xwe li nik Dewletên Hevbend dibîne, û ev şer dibe şerekî cîhanî.

**Veger li Şerê Bizavê 1917-1918an:**

Piştî vekişandina Ûris ji şer û serkeftina şoreşa Belşevî di sala 1917an de, bi serkêşiya Lînîn û girêdana peymana Brîst Lîtofisk di sala 1918-an de bi Elman re, êdî Elmanan bi çavekî sor êrîşî Fransa kirin. Lê, jiber hevgirtina hêzên Brîtanî û Ferensizan bi serkêşiya serdarê Ferensiz Foş, ew êrîşa Elmanan biserneket û zora ji wan hate birin, û ew di şerê Marin li başûrî-rojhilatî Fransa şikestin.

## Serkeftina Dewletên Hevbend:

Di sala 1917an de, û bi gihiştina hêzên Emêrîkanan li Ferensayê, guherîneke mezin şopandin. Jiber ko Emêrîkan piştgiriya hêzên dewletên hevbend kir, wan êrîşî hêzên Elmanan kir û ew ber bi paş ve vegerandin. Di wê demê de hêzên Dewletên Hevbend zora hêzên Osmaniyan li Sûriyê birin, û berê xwe dabûn Asiya biçûk bi xwe. Di sala 1918an de, li Belqanê hêzên dewletên hevbend Bilxariya naçar hiştin ko darê xwe dayne. Di wê salê de, dewleta Osmanî û Nemsayê jî lihevhatinê ji wan dixwazin. Vêca, tu rê li pêşiya Elmanan ji bilî radestiyê neman, nemaze piştî hilweşandina girêbenda sêqolî. Ewê jî ji neçarî di 11ê novembera sala 1918an de, peyman bi dewletên hevbend re girêda.

## Şerê Sala 1917an:

Di sala 1917an de, bûyerê herî giring û balkêş serkeftina şoreşa Belşevî bû, lihevkirina sala 1918-an ya bi navê Brîst Lîtofisk di nav wan û Elmanan de û derketina Ûris ji şer.

Di vê salê de, Ferensiz bi alîkariya ingilîzan êrîşeke mezin dan Elmanan. Lê, mixabin ew êrîş biser neket û ziyaneke gewre li hêza Ferensizan bû û leşkerên wan li ber wan rabûn û ji hev veqetiyan. Lewra,, ji nû ve gelek guhertin di nav serbaz, salar û leşkeran de çêbûn.

Brîtanî jî haydar bûn ko Elman pir guh didin eniya wan, lewra şerek pir mezin li wir rabû, li dora (300) hezar leşkerên brîtanî hatin kuştin û birîndarkirin. Gelek qurbanî li ser eniya Ûris, Ferensiz û îtaliyan jî hatin dayîn. Digel ko ew di destpêkê de hin caran biserdiketin jî, nemaze zora Osmaniyan birin û derbasî îraq û felestîn bûbûn, lê gelek qurbanî dan.

Qîrîna Mirinê ....................................................................30

## Dawiya Şerê Sala 1918an:

Derketina Ûris ji şer bû sedemê ko Elman (400) hezar leşkerê xwe ji eniya Ûris bikşîne eniya ingilîz û Ferensizan û dest bi şer kir. Di wî şerî de, gelek mirov hatin kuştin, bi sed hezaran birîndar bûn, gund û bajar, sera û qûnax, avahî û xirçik, bêlan û hesar, gulh û mesîl bi dirinde wêran bûn, û gelek mal û pere hatin rijandin. Dibêjin ko di wî şerî de li dora her demjimêrekê deh milyon doler di hatin danîn.

Dewletên hevbend tevan bi hev re leşker, top û balafirên xwe amade kirin û êrîş birin ser Elmanan. Di 8ê Tebax/oxustos, sala 1918an de, ev roj di dîroka Elmanan de, rojeke reş bû. Di vî şerî de, Elman li hemberî Dewletên Hevbend û Birîtaniyan  şikestin û ji hev tarûmar bûn. Di qûnaxa sê mehan de, li dora (250) hezar Elmanî dîl hatin girtin. Li seranserî Elmaniyayê, alozên ramyarî vêca peyda bûn û pir diltengî ji van hilweşandin û şikestinan hatin meydanê. Lewra,,

Elmanan doza sekinandina şer kirin bê tu peyv û gotinê. Lê, Dewletên Hevbend razî nebûn ko li ser destê vê imperatoriya heyî tu çare were kirin. Ji neçarî imperatorê Elman li mala xwe rûnişt û Elmaniya bû komar. Piştî şerê çar salan û kuştina deh hezar leşker û birîndarkirina bîst û yek melyon û nîvî kes, di 11ê Novembera sala 1918an de, hiştin ko Elman binavînin, ango imze bikin.

## Kongirê Aştiyê 1919an:

Di 11ê Novembera 1918an de, li ser bingeha bîr û baweriyên Wîlson, Elman biryara sekinandina şerî dan, û li ser wan baweriyan hêviyên mezin dabûn ber xwe ko biryarinen payebilind bêne wergirtin. Lê mixabin, tiştekî weha nebû. Kongirê Aştiyê di 18ê Yenayer 1919an, de, bi beşdariya nûnerên (32) sî û du dewletên hevbend, li hev rûniştin. Kesên ko li vî kongirî beşdar nebûn û jê dûr xistin ji dewletên di şer de şikestibûn; ango, yên di şer de ser neketin û ji nav wan jî Ûris û hin dewletên ko neketibûn nava şer. Diyar e, ev kongir ji bo parvekirina terş û talanan bû. Ji bo bicihkirina hin xwestek û daxwazên dewletên serketî û serefraz bû û bi taybetî ji Emêrîka, Fransa û Brîtanyayê re bû.

**Xwestekên Beşdaran:**

Di serî de, Fransa û Brîtaniya firehkirina sînorê xwe xwestin û vegirtina hin dewletên nuh doz kirin. Ne tenê Fransa doza vegerandina herdû herêmên xwe, Elzas û Lorîn, ji Elman kir, belê doza delava çepê ji çemê Raynê û herêma Sar ya Elmanî kir. Belê, ji bo dewletên mêtingeh serokê şanda Fransa Corc, ku ew serokwezîrê Fransa bû doza mêtingehên xwe li başûr û navîna Efrîka, bakurî-rojhilatî Asiya, Sûriya û Libnanê kir, û qet ne bi dilê wan e û rê nadin tukesî ko danûstendin li ser çê bibe. Ango, bi qutbirînê û bi darê zorê ye. Lê, daxwazên Fransayê ne bi dilê serokê şanda Brîtaniya, serokwezîr Lwîd Corc, bûn. Wî doza mêtingehên Elman li Efrîka û Rojhelatî Asiya kir, û sîdariya ser Misr, Sûdan, Felestîn û Îraqê jî kir. Lê, serokwezîrê Îtalya Orlando doza vegerandina du herêmên xwe, Tirantan û Trîsta, kir. Lê, serokê Emêrîka Wîlson ji nav tevan rabû û doza avakirina (Usbet El-umem) kir, û doz li wan serokên şandên

dewletên mezin kir ko hemû biryarên kongirê wan divê li ser biryara her çarde bendên bîr û baweriyên wî bin.

**Biryarên kongir û serencam:**

Di serî de, nexşeya ramyarî li Ewropayê hat guhertin.

Kongirê Parîsê biryara jihevxistina imperatoriya Elmaniya û Nemsayê wergirt, û doza xweşkirin, sazkirin û dûzkirina sînorê ramyarî di nav dewletên Ewropî de kir. Jiber van egeran dewletin nuh li ser rûyê xaknîgaşa Ewropî diyar bûn, mîna Mecer, Çîkosilovakiya û Yûxislafya. Gelek dewlet jî sîstema welatê wan hate guhertin mîna Turkî û Elmaniyayê ku bûn komar, û Nemsa (Austirya) jî bû komareke biçûk. Lê, piştî şoreşa 1917an ya Belşevî bi serkêşiya

Fladîmêr Lînîn, Rûsiya  ji sîstema qeyserî bû sîstemeke qomonîst.

Kongir li ser daxwazên Brîtaniya û Ferensa erêkir ku dewletên Rojhelata Erebî di bin sîdariya wan de bin.

**Peymana Firsay 28ê /Cehzerdan/ 1919an:**

Ev peyman ji biryarên kongirê Parîsê yê herî tund, hişk û giran bû. Ew ji bo serçimandina miletê Elman û kêmkirina wî bû. Bêdiro! Doza şanda Elmanî kirin, û li Fransayê li derdora Parîsê, bi darê zorê, peymanê bi wan binavînin. Ew peymana ko di naveroka xwe de gelek mercên hişk û giran hene, lê ya herî giring ev e: Qutkirina bîst û pênc hezar mîlê çarkuç ji erdên Elman û bi ser erdê Polenda, Danîmark û Çîkosilovakiyayê ve berdin. Ji hêleke din jî, Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû ko erk û stûbarê wan û supah û şervanên wan jî ji hev belav bikin. Ango, tevan rêkin malên wan.

## Avabûna Civata Miletan

## (Usbet El-Umem):

Li ser dawaza serokê Emêrîka Wilson, hemû serokên şandeyên beşdar li ser avabûna Usbet El-Umem erê kirin, ya ko bi darê zorê derbasî hemî qeyd û peymanên wan dewletên serketî û binketî bû. Armanca sereke ji avakirina vê Usbet-ê çareserkirina nakokî û nelihevkirina dewletan di riyên aştiyane û danûstendinê re, û dûrî şer û pevçûnê bikeve. Him jî bawerî di nav miletan de çê bibe. Cihê Usbet El-Umem wê li şarê Cinêv li Siwêsra be.

Lê mixabin, karûbarên ko bûn, ne li gorî hêviyan hatin. Tu hêza leşkerî û supahê Usbet El-Umem ji bo bicihkirina biryaran nebû. Vêca, bû mîna destekekê ji dewletên serketî re. Digel ko Emêrîka bû xwediyê birayara avakirinê, lê qet endametiya xwe di Usbet El-Umem de, bikar nanî.

## Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Bandora Wî li Cîhana Erebî:

Dewletên Erebî berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn di nav hêzên mezin de parvekirî bûn; Cezair, Tûnis, Mexrib, Morîtanya, Somal û Cîbotî di bin sîdariya Fransa de bûn. Mesr, Bakurî Cezîra Erebî û Rojhelatê wê, Eden, Uman, Behreyn û Kiweyt di bin sîdariya Ingilîstanê de bûn. Lê, Lîbya di bin destê Îtaliya de bû, û Osmanî tiştê mayî ji welatên Ereb yên Rojhelat mîna Şam, Îraq, Hicaz , Kobetên Hesîr, Yemen û Tengava Erebî di bin destê wan de bû. Lê Necid di bin fermana Lawê Reşîd û lawê Si'ûd de bû.

Piştî dewleta Osmanî derbasî şer bû û li nik Elmaniya cih girt, rê li ber Dewletên Hevbend vebû û xwe pir nêzî dewletên Erebî kirin, û roj bi roj destê xwe dirêjî nav wan kirin. Helwesta dewletên Erebî ew bû ko, di bin siya dewleta Osmanî de yekîtiya xwe biparêzin. Lê, jiber ramyariya Osmanî ya tûj û dijwar û setemkariya

wê ya tund û neguhdana wan li karûbarê Ereban, pir nexweşî u nakokî di nav wan de peydabûn, û têkiliyên wan têkve çûn.

Ji hêleke din ve, Brîtaniya soza dabû Ereban ko ewê ji wan re dewleteke Erebî serbixwe û gewre ava bike. Lê, Brîtaniya ne tenê soza xwe paşguh û binpê kirin, belê ewê û Ferensiza peymana Saykis-Bîko jî pêkanîn. Ev peyman jibo parvekirina Rojhelata Navîn, û xwe-amadekirin jibo avakirina dewletekê li Felestînê ji Cihiwan re.

**Danûstendina Ereban û dewletên hevbend:**

Di navbera dewleta Osmanî û aldarê Mekê û mala pîroz ya misilmanan, Şerîf Huseyn lawê Elî de, pir dilgiranî hebû. Şerîf Huseyn  û lawên xwe bi hêviya avakirina dewleteke Erebî gewre mijûl dibûn. Jiber vê helwestê piraniya Ereban li dora xwe komkirin. Brîtaniya dixwest Ereban ber bi xwe ve bikşîne; wê bi awayekî raz, têkiliyên veşartî  û bi nihartina nameyên ne eşkere bi Şerîf

Huseyn re dest pê kiriye. Ew nameyên ko bi navê (Nameyên Huseyn-Mikmahon) hatine naskirin. Ji alî û bi hevsojiya Ereban Şerîf Huseyn, û ji alî Brîtaniya Sêr Hinrî Mikmahon bûn. Di wan nameyan de, Şerîf Huseyn ji Brîtaniya re diyar kir ko daxwaza Ereban ji bo derbasî şer bibin û li rex Brîtaniya bisekinin; divê serxwebûna dewletên Erebî yên li ser perava Rojhelat ya derya Spî û avakirina dewleteke Erebî gewre li tevaya cîhana Erebî be, pêvî Mesir û başûrê Efrîkayê. Digel ko ewan û Mikmahon li ser sînorên dewleta Erebî lihev nekirin jî, Ereb ketin şer û li rex  Brîtaniyayê sekirin.

**Şoreşa Ereban ya Mezin 1916an:**

Di 10 Yonyo /Hezîrana 1916an de, Şerîf Huseyn li defa hawarê xist û danezana cangorî û şoreşa pîroz, bi piştgiriya serbazê asayîşa Brîtanî Lorens (yê ko bi navê Lorensê Ereb dihat naskirin) li hemberî Osmaniyan, û dest bi Şoreşa Erebî ya Mezin kir. Lawên Şerîf Huseyn dest

danîn ser Hicazê û bi alîkariya Ingilîzan lawê wî Feysel berê xwe da Şamê û derbasî Dîmeşqê bû piştî ko bera Osmaniyan  da, û li wir danezana hukûmeteke Erebî ragihand û piştgiriya danezana bavê xwe kir, bi navê Şahê Ereban. Lê, Dewletên Hevbend ew wek şahê Hicaz û Rojhelatî Urdon tenê, ne yê Ereban tevan dipejirandin.

Brîtaniya dest bi danûstendin û peymanên nepenî û nehênî bi Fransa û Rûsiya  re kir. Ew danûstendin ne tenê li ser parvekirina dewleta Osmaniyan  bû, lê belê li ser welatê Ereban jî bû.

Di 16/5/1916an de, Brîtaniya û Fransa peymaneke veşartî bi navê peymana (Saykis-Bîko) di nav hev de girêdan. Mark Saykis ji hêla Brîtaniya û Franswa Corc Bîko ji hêla Fransa ve bûn.

Di sala 1917an de ev peyman hat xuyakirin, nemaze piştî şoreşa Belşefî li Rûsiya. Di wê salê bi xwe de, Brîtaniya sozên xwe li hemberî Ereban binpê kirin û gotina xwe ne bir serî. Belê,

soz da giregirên cihûwan bi avakirina welatekî neteweyî li Felestînê, bi navê (Peymana Belfor) ya ko di 2-ê November/Çirya Paşîn ji sala 1917-an de, derket.

**Welatên Ereban di Bin Sîdariyê de:**

Di sala 1918an de, peymana Saykis-Bîko kete çerxê û hate çespandin.

Di sala 1919an de, li Parîsê kongirê (Sulh) hate girêdan, û di wî kongirî de awireke nuh ji angoya mêtingehê re hate pêşinyarkirin. Ev awir û dîtin ji hêla serokê Emêrîka Wilson û serokwezîrê Bakurê Efrîka ceneral Smites ve hate pêşkêşkirin, ya ko dibêje divê dewletên mezin îş û karûbarê dewletên nuh avabûyî li xwe bigirin û ew karûbarê wan birêve bibin; ewên ko demeke dirêj di bin serdariya imperatoriyan de mane, heta ko bi ser nigê xwe ve bisekinin û karibin îş û karê xwe bi xwe bikin, divê di bin destê dewletên mezin de bin. Lê, kongirê Sûriya yê giştî bi peymana Saykis-Bîko û  Soza Belfor

razî nebû, û avakirina Memleketa Sûrî heşkere kir, û Mîr Feysel bû mîrê Sûriyê. Di cih de, encûmena bilind ya Dewletên Hevbend li bajarê San Rîmo yê Îtalyayê di Ibrîl/Nîsana 1920-an de, li hev rûniştin û bersiva kongirê Sûriyê dan bi çespandina peymana Saykis-Bîko, ya ko dibêje: Divê Sûriya û Libnan di bin sîdariya Fransa de bin, û Îraq, Felestîn û Rojhelatê Urdon di bin sîdariya Brîtaniya de bin.

Kongirê (San Rîmo) soz da ko kar di ber çespandina (Soza Belfor) de bike, û Brîtaniya amaje pê kir ko Îmaratên Erebî yên li ser delava Tengava Erebî di bin parastina xwe ke. Dîsan serdestiya biyaniyan li Başûrê Efrîka hate çespandin. Brîtaniya destê xwe danî ser Mesir û Sûdanê. Îtalyayê jî destê xwe danî ser Lîbyayê. Fransa jî destê xwe danî ser tiştê mayî ji Rojavayê Erebî û tevî Tûnis, Mexrib, Ceza'ir, Morîtanya û Somal.

## Parçekirina Kurdistanê Cara Yekemîn Sala 1514z:

Pirsgirêka Kurdî ji şerê herdû dewletên mezin Sefewî û Osmaniyan (şerê Çaldîran 1514z) ve, dest pê dike. Ji ancama vî şerî; Kurdistan di nav xwe de parçekirin.

Berî sala 1514an, li Kurdistanê mîrnişîniyên serbixwe hebûn, û bi rêrew û rêdanên wan bi karûbarê xwe yê hundirî mijûl bûn. Her mîrnişîniyek di herêma xwe de, nîv-serbixwe bû. Lê, jiber setemkarî û bêciriya Şah Ismaîlê Sefewî, û jiber cudahiya olî /mezheb/, tevahiya mîrnişînên Kurdî xwe spartin dewleta Osmanî. Di vê xwesipartinê de, em rola zanyarê mezin mele Idrîsê Bedlîsî jibîr nekin. Bi vê yekê para mezin ji xaka Kurdistanê dikeve bin destê Osmaniyan . Evî şerî, şerê Çaldîranê, Kurdistan du-parçe kir bêyî ko di riya rêkeftin ên rêdanî re bê çespandin.

Di sala 1515an .z de, Zanyarê Kurd mele Idrîsê Bedlîsî li ser daxwaza Padîşahê Osmanî rêkeftin ek bi mîrekên Kurdan re girê dide. Di vê rêkeftin ê de hatiye: "Dewleta Osmanî aşartinê bi axatî û mîrîtiya wan li ser xaka Kurdistanê dike, û fermandariya wan cihşînî dimîne. Ji Kurdan jî tê xwestin ko piştgiriya Astana bikin; eger êrîş an destdirêjî di dermafê wê de bû, ji mîrnişînan tê xwestin ko pereyên salane bidin dewletê; jiber ko ew mîrnişînên Kurdî pêrewî dewleta Osmanî ne. jiber vê yekê, eger supahên Osmanî rojekê bikevin şerekî, ji mîrnişînên Kurdan tê xwestin piştgiriya wan bikin. Ji hêleke din ve jî, divê navê desthilatdarê Osmanî di gotina roja înê de, di mizgeftan de, bê gotin û jê re lavijan bikin".

Li gorî vê rêkeftinê, dewleta Osmanî beliyandina aşartina wê bi desthilatdariya Kurdî li ser xaka Kurdistanê dide, û ev tiştekî pir mezin û giring e. Ev rêkeftin  bicihkirina hebûna pirsgirika Kurdî ye, divê û tê xwestin, dûr-nêzîk, ko ev pirsgirêk çareser bibe.

Di sala 1555z de, herdû dewlet, Sefewî û Osmanî rêkeftin ek bi hev re girêdan. Ev rêkeftin bi navê Emasya hat naskirin. Osmanî û Îraniyan, li ser xaka Kurdistanê nêzîkî 120 salan şer kirin. Di sala 1638an de, padîşahê Osmanî Muradê Çaremîn bajarê Bexdayê jî, ji Îraniyan girt. Jiber vê yekê heta sala 1639an, şer di navbera Faris û Osmaniyan de dirêj kir. Hem Osmanî û hem jî Faris ji aliyê aborî û leşkerî ve gelek perîşan bûbûn. Di sala 1639an de, herdû alî - Şah Ebas û Sultan Muradê Çaremîn - li bajarê Qesir Şêrîn peymanek çêkirin. Ev rêkeftin a yekemîn ya fermî bû ko di nav herdû dewletan de tê kirin. Li gorî vê rêkeftinê, parçekirina Kurdistanê bi şêweyekî fermî çespandin, û li gorî vê belge û doznameyê sînorê herdû dewletan hat kişandin. Perçak ji Ermenistan û Azerbeycanê dane Osmaniyan û Kurdistana Îraqê ya Îroyin jî dan Îranê. Faris û Osmaniya çiyayên Agirî û Zagrosê di navbera xwe de tixûb û sînor çespandin. Piştî peymana Qesir Şêrîn jî, çend caran di navbera

Îran û Osmaniyan de her çiqas şer û lec li ser tixûb derdiketin jî, heta îro tixûbên nav herdû dewletan, li gor peymana Qesir Şêrîn maye.

Piştî vê rêkeftinê, gelek peyman û rêkeftinên din çê bûn. Ji wan: peymana Erzerom û Erzeroma duyemîn 1847z, û rêkeftin a Tehran di 1823z, û rêkeftin a rêûsazê sînorên herdû dewletan, dewleta Îranî û Osmaniyan di sala 1913an de, li Astanayê û…hwd. Mixabin ev peyman û rêkeftin ên bûyîn tevan herhe parçekirina Kurdistanê çespandin. Jiber vê yekê, roj bi roj, pirsgirêka Kurdî pirtir girêkutkî dibû, û bi taybetî di destpêka babilîska nozdehan de, dema ewropiyan di riya gerokên biyanî û şandekên xwe re, û hem di riya hin ramangîr û qunsilan re hêdî hêdî xwe berdidan nava Kurdistanê; ji wan yên destkewtî û giring: Brîtaniya, Rûsiya, Fransa û Emerîka bûn.

## Şerê Cîhanê yê Yekemîn

## û Doza Kurdan:

Bêguman, di destpêka sedsala 20an de, ramana neteweyî bi rêya perwerdekirinê, rêxistinên civakî, xebata weşan û çapemeniyê belav dibe, weke weşandina [Kurdistan-1898, rojnameya Te'awûn û Teraqî ya Kurd, Rojî Kurd-1913, Jîn-1918, wd.] û rêxistinên [Cemiyeta Azm-î Kavî ya Kurdistanê, Cemiyeta Hêvî ya xwendekarên Kurd, Cemiyeta Te'alî ya Kurdistanê û wd.] destpêka xebata neteweyî ya Kurd tê zanîn.

Ji bo pêşxistin û pêşvebirina civaka miletekî û pêkanîna mafên wî yên neteweyî, berî her tiştî damezrandina tevger, bizav û rêxistinên neteweyî pêwîst e.

Di pêşgotina kovara Bîrê de weha hatiye:

"Dema ku em li gor vê yekê li tevgera Kurd a sedsala 20an binêrin, naveroka siyasî ya vê tevgerê hîn bi asanî tête têgihîştin. Piştî têkçûna tevgera Şêx Ubeydulahê Nehrî, bi wesîteya serkêşiya olî û terîqeta Nexşî, serokatiya tevgera Kurd derbasî malbata Barzaniyan dibe. Cara pêşî Şêx Evdilselam, bi taybetî eşîr, êl û şexsiyetên cûda yên herêma Behdînan, ji bo armanceke siyasî, di bin serokatiyekê de tîne ber hev. Di Bihara sala 1907an de, bi beşdarbûna hejmareke girîng ji serokeşîrên Kurdan, di bin serokatiya Şêx Evdilselamê Barzanî de komcivînek tête lidarxistin. Di vê komcivînê de, biryarên ku têne standin bi erêkirina hinek şexsiyetên navdar ên Kurdan jî, wek daxwazên miletê Kurd ji bo rêveberiya (Dewleta Osmanî) têne pêşkêşkirin:

"1-Divê zimanê Kurdî di herêma Kurdan de wek zimanê fermî bête qebûlkirin.

2- Divê hînkarî û perwerdekirin bi zimanê Kurdî bête kirin.

3- Divê qaymeqam, kargêrê nehiyê û karmendên din ji kesên ku zimanê Kurdî baş dizanin, bêne bijartin…"

"Ev têlgiraf ku gehîşte ber destê rêvebirên Dewleta Osmanî, daxwazên Şêx Evdilselam û hevalên wî wek cûdaxwazî û serhildaneke li dijî dewletê hatin şirovekirin. Mixabin ku bi bêbextî, Şêx Evdilselam tê girtin û di dawiya sala 1914an de li bajarê Mûsilê tê bidarvekirin".

Bêguman, kefteleft û berberiya dewletên mezin di dunyayê de, û bi taybetî ji hêla herdû hêzên mezin Brîtaniya û Rûsiya li ser Rojhelatê, bandoreke nebaş li paşeroja gelê Kurd kiriye. Berî her kesî, Rûsiya lez da xwe û dest bi têkilî û danûstendinan bi hevsînorên xwe yên Kurd û Ermen re kirye, û pişt re Brîtaniya. Lê, Rûsiya gelek guhdan li rewşa welat û gelên nêz û hevsînorên xwe dikir. Brîtaniya bi çavekî ne rehet li tevger û liva Rûsiya dinêrî, û tirsa wê ji destdirêjkirina Rûsan ko bigihê Kurdistanê

hebû. Ji hêleke din ve, Ferensizan di riya gerok û şandeyên mizgînî û hişyarkirina li ser ola Îsa xwe bera Kurdistanê didan.

Kurd bê rêxistin, bê siyaset û serokatiyeke hevgirtî, bi hêviya derbasbûna dewletên imperyal ên gewre, çar salên pêvajoya Şerê Yekem yê Cîhanê bihûrandin. Ta ku sala 1918an, di bin serokatiya Sey'îd Evdilqadir de Komeleya Te'alî ya Kurdistanê hate damezirandin. Li başûrê Kurdistanê jî sala 1919an, bi serokatiya Şêx Mehmûdê Berzencî şerê dijî İngilîzan dest pê kir.

Bêdiro! Di destêpa babilîska bîstan de, Kurdan dixwestin xwe nêzî dewletên Ewropî bikin, û li ber xiroşmeya wan govenda xwe bigerînin û bi taybetî, bi Brîtaniya re, di riya diblomasê xwe yê navdar Şerîf Paşa re. "Tê naskirin ku Neteweya Kurd, di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, wek rêxistinî ne di haziriya şer de bû. Jiber hindê gelê Kurd berxwedana rizgariya neteweyî ya Kurdistanê bê rijandina xwînê dabû ber xwe, bi

riyên dîplomasî bikar bênin". Di sala 1914an de Şerîf Paşa xwe gihande Ingilîzan û xwest bi wan re bide û bistîne. Lê, mixabin hukûmeta Brîtanî deriyê xwe jê re venekir. Di sala 1918an de, di dema ko Brîtaniya Îraq xiste bin destê xwe, doza hevdîtinekê ligel Şerîf Paşa di riya sefîrê xwe "Bersî Koks" re, li Mersîlyaya Ferensizî çê bibe û tenê guhdarî li daxwaz û xwestekên Şerîf Paşa bê kirin.

Di sala 1916an de wezîrên derva yên Rûsiya, Brîtaniya û Fransayê li hev civiyan, û danûstendinên penhanî li ser dariştina paşeroja Rojhelata Navîn kirin, piştî ko nêzîkbûn li rûxandin û şikestina Elman û hevbenda wê dewleta Osmanî bûye. Ev rêkeftin ji bo parvekirina dewleta Osmanî bû, û jiber ko para mezin ji erdê Kurdistanê di bin destê Osmaniyan de bû, Kurdistan jî pê re hate parvekirin. Di 16/5/1916an, di riya van her sî dewletên mezin re, û bi navînkirina peymana Saykis – Bîko ya reş, Kurdistan parçekirin, û rewşa pirsa Kurdan

pirtir girêkutkî kirin. Bakurê Kurdistanê giha Turkiya, başûrê Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê Kurdistanê giha Sûriya û ji xwe Rojhelat tev di bin destê Îranê de maye. Îran bi xwe neketibû ber vê peymanê. Evê peymana malwêran hemû hêvî û omîdên Kurdan rûxandin.

Di peymana Sykes- Picotê de, başûrê Kurdistanê jî di nav de Iraq, wek herêma nifûsa İngilîzan hatibû qebûlkirin. Hêzên leşkerî yên İngilîz, 7ê Nîsana 1918an di bin serokatiya General Marshall de, bajarên Kerkûk û Silêmaniyê dagir kirin û bi vê dagirkirinê, Kurdistana Başûr hemû kete bin desthilata İngilîzan. Ji bo Kurdan rewşeke nû pêk hatibû. Ji bo nirxandina vê rewşa nû, serokeşîr, rewşenbîr û alimên wê herêmê bi serokatiya Şêx Mehmûd civînek girêdan. Di encama vê civînê de, biryareke hevpar hate standin û ji bo berpirsê leşkerî yê Kerkûkê jî hate verêkirin. Di vê biryarê de hatibû daxwazkirin: "Divê hikûmeta Kurdistanê bête damezirandin û Şêx Mehmûd jî

bibe serokê vê hikûmetê." Li gor vê biryara hevpar, di 22'yê Gulana 1919an de, Şêx Mehmûd li bajarê Silêmaniyê damezirandina hikûmeta Kurdistanê û kraliyetiya xwe ragihand. Lêbelê, jiber nakokiyên di navbera Şêx Mehmûd û İngilîzan de, ji demeke kurt şûn de di navbera herdu aliyan de, şerekî dijwar dest pê kir. Ew tevgera neteweyî ya ku bi serokatiya Şêx Evdilselam Barzanî dest pê kiribû, bi serhildana Şêx Mehmûd digehîje qonaxeke nuh. Lêbelê, malbata Barzaniyan di dema serokatiya Şêx Ehmed de jî dev ji dozê bernadin. Ji herêma Behdînan nêzîkê du sed pêşmerge bi serokatiya Mistefa Barzanî ji bo piştgiriya tevgera Şêx Mehmûd berê xwe didin bajarê Silêmaniyê. Heta ku ew digehîjin herêmê, şer bi dawî dibe, û Şêx Mehmûd jî ji aliyê İngilîzan ve bi birîndarî tête destgîrkirin. Bi vî awayî jiyana hikûmeta yekemîn a Kurdistanê pir dirêj najo. Piştî destgîr-kirinê, Şêx Mehmûd ji bo Hindistanê têtê sergûnkirin.

Qîrîna Mirinê ........................................................................56

## Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Doza Kurdan:

Piştî rûxandina dewleta Osmanî, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, Kurdan derfet û nîrekî nuh di derbirîn û çareserkirina pirsa xwe de dîtin, nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çarde-xal de; ji bo mafên miletan bi azadî û serxwebûnê bê çespandin. Derfeta Kurdan pirtir çêbû dema ko di pey wê re, herêmeke navbir di navbera Tirkên Enadol û neteweyên li Asiya Navîn, Qafqas û Ezrebêcanê de, ko bi zimanê Tirkî dipeyivin hate xwestin.

Di sala 1919an de, di (Kongirê Sulh) de, Kurdan li Parîsê sowet û hêviyek ji bo çareser-kirina pirsa xwe dîtin, û li gorî wê hêviyê, dest bi tevger û lebata xwe kirin. Lê, mixabin jiber ko Kurd ne xwedî dewlet bûn, şandeyên wan bi awayekî fermî beşdarî civînê nekirin. Lewra, rewşa wan jî mîna rewşa neteweyên ne xwedîdewlet û bindest hat dîtin. Miletê Kurd di

riya êl, hoz û sazî û dezgehên ramyarî re wek nûnerê xwe Şerîf paşa dane pêş.

Di meha çile ji sala 1919an de, hevbendan karûbarê girêdana kongirekî bi ser hev de anîn, û biryar dan ko; "Hevbendan û dewletên pêrewî wan beliyandin û li ser ko Ermîniya, Mezobotamiya, Kurdistan, Felestîn û Welatên Ereban ji imperatoriya Osmanî bi carekê qut bikin, erê kirin". Li gorî pîvana wergirtina vê biryarê, nûnerê Kurdan Şerîf paşa du dozname digel du nîgaşên Kurdistanê pêşkêşî kongir kirin, yek jê di 21/3/1919'z, û ya din di 1/3/1920'ê z de bûn, û ji kesên ko rêveberiya kongir dikin xwest ko "Komîtekê ji bo kişandina sînoran li gorî koka neteweyan bê damezirandin". Herêmên ko piraniya nişteciyên wan Kurd in bibin Kurdistan. Jê bêhtir, di doznameya yekemîn de weha hatiye: "Parçekirina Kurdistanê ne di berjewendiya aştiya Rojhelatê de ye". Di doznameya diwemîn de jî hatiye: "Li ber çavan Turk bi daxwazên Kurdan re ne lê, di rastiya xwe de qet tiştekî

weha nîn e…". Şerîf paşa bi awayekî fermî ji serokê kongir - Corc Klîminso - xwest ko diyalog û desthilatdariya xwe li hemberî setemkariya hukûmeta Astana ya li dijî Kurdan bikar bîne, û wê setem û neheqiyê rawestîne. Di doznameya wî ya jibo serokê kongir de hatiye: "Ji dema ko xelkên "Îtîhad û Tereqî" desthilat wergirtin, cihê her kesê welatparêz û azadîxwaz zindan û giriftarî ye… jiber vê, û jiber erk û stûbarê mirovayetiyê, ji encumena bilind tê xwest vê kuştina ko dest pê kiriye rawestînin … Rêça dabîn û dilniyama aştiyê li Kurdistanê ew e ko dev ji pirojeya parçekirina wê berdin…".

Nezîr Semmikanli di gotara xwe: "ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEMÎN (1914-1918) - PEYMANA SEWRÊ YA AŞTIYÊ" de dibêje:

**Şerîf Paşa di nexş û doznameya xwe de sînorên Kurdistanê weha diyar kiribû:**

"...Ez dixwazim rewatiyên Neteweya Kurd li pêşberî Konferensê zelal bibêjim. Ji aliyê

etnografî ve, sînorên Kurdistana Osmanî ji aliyê Bakûr ve ji Zivendeya Qefqasan dest pê dike, ber bi rojava ve heta Erzerom, Erzingan, Kemah, Erebkêr, Erbîl, Kerkûk, Silêmanî, EkElman û Sine ye. Ji aliyê Rojhelatê ve jî Rewendiz, Başqele, Wezîrqele, û ji sînorê Îranê yê nû heta Çiyayê Agirî didomîne".

"Kurdan li vê herêmê ji tarîxa pir kevin ve, bi gelek navên cuda û ji berî sedsala 13an ve jî, bi navê Kurd bingera xwe vegirtine. Heta dema Siltan Selîm ku ew li gor daxwaziya xwe pê ve hatine girêdan, ji 46 mîrnişniyên serbixwe hatine holê. Weke Diyarbekir, Dinwer, Sary Sul, Ler, Ardial, Hekarî, Emadiye, Kurkel, Finik, Hesenkêf, Cemsgozek, Mirdas, Egil, Sasûr, Hezan, Kilîs, fiêrwan, Derzin, Xak, Terkel, Seyd, Silêmanî, şehran, Tekûl, Qele, Dawid, Pelinkan, Bedlîs, Xerzan, Botan û hwd. di bin desthelatdariya begantiyan de bûne..."

Lê belê, di pêveka nivîsa wê seredanê de, di nexşeya Kurdistanê de, kêmasî di peyîtandina sînorên Kurdistanê de hebû û xeberdan belav bûye ku beşekî mezin ji xaka bakûrê Kurdistanê dane Ermeniyan. Li ser wê yekê, nerihetiyeke mezin di nav rêxistinên Kurd ên netewî de dest pê kiriye. Îcar ji bo rastkirina wê şaşiyê, Sey'îd Ebdulqadir ku wê demê serokê senatoya Osmanî bû, bi xeysetê Serokê Navenda Konseya Kurd digel nexşeyeke nû ya Kurdistanê, bi nivîsekê serî da Komsêrtiya Fransa ya Bala ku li Stenbolê bû da bişîne Konferensa aştiyê. Bi kurtî nivîsa wê seredanê ev e:

"Di 22-yê Adara 1919an de, ew nexşeya ku ji aliyê General Şerîf Paşa ve hatiye hinartin, di sînorên bakûr de hin cudatî têne dîtin. Ew herêmên ku akinciyên wan %70 Kurd in, li derveyê nexşeya ku Şerîf Paşa destnîşan kiriye mane. Wisa tê zanîn ku ew têr nehatiye agahdar-kirin... Wek encam divê ku General tevahiya sînorên bakûr, digel rêderketineke li deryaya Sipî

biparêze. Lewra, ji bo berfirehtiya aboriya vî welatî pêdivî ye."

Li virê peyîtandina sînorên Kurdistanê yên kêm, bi daxwaza sererastkirina sînorên Kurdistanê, ji aliyê dewletên biserketî ve, hate xwestin ku ew çend bajarên bakûrê Kurdistanê dê ji Ermenistanê re hatibûna hiştin, ji xaka Kurdistanê ne. Wekî din jî, bal kişandiye ser sînorên Kurdistanê jî ku dê bigîje Deryaya Sipî. Ew, peyîtandineke rastîn bûye.

Ji aliyê din ve jî, gotineke weha belav bûbû ku Kurdistanê wek du herêmên otonom ên serbixwe, bi navê bakûr û başûr dê bêne dabeşkirin. Lê belê, Seyid Ebdulqadir daxwaz kiriye ku xelkê Kurd li pêşberî vê yekê ye û Kurdistaneke Yekgirtî û Serbixwe dixwaze, û daxwazeke nivîskî şiyandiye Konferensa Parîsê ya Aştiyê. Nivîsa wê serlêdanê ev e:

JI SEROKATIYA KONSEYA BALA YA LI PARÎSÊ RE

Birêz, Serok!

”Ew gotina ku Kurdistanê kirine du beş wek bakûr û başûr ranaweste. Em bala we ekselansan dikişînin bal wê yekê ve ku, Kurdistaneke dabeşkirî, rewşa Rojhelata Nêz hêzdar nake. Kurdên ku ne di binê desthelatiya Hikûmeta Îtîhad û Teraqiyê de bûn, bikaranîna çek li pêşberî hêzên hevpeyman bi şûn ve dane. Ew herêmên ku Osmanî desthelatiya xwe lê nikaribûn vegirin, Kurdan gelê Ermen parastin. Niha em ji wekhevîtiya Konferensê hêvî dikin ku Kurdistaneke yekgirtî binase. Bi rastî jî, dabeşkirina wan sînorên ku me bi şeref pêşkêşî Konferensê kiriye, di navê de bi cudakirina formên etnîkî û dana mandeya hêzine din, ber bi tarîtiyeke bênasîn ve diçe.

Konstatinop / 2. 10. 1919

Senator Seyid EBDULQADIR

Serokê Konseya Navendî ya Lîga Kurd"

Ev girova erênî diyar e ko doza Kurdî derbasî qûnaxeke nuh dibe û gelek gavên hêja pêş ve avêtine. Nemaze danezana ko Corc Klîminso di kongirê (Sulh) de, û li ber tevan da diyarkirin û got: "Hukûmeta Turk nikare li ber erk û barê rêvebirina karûbarê miletên din rabe, û ne li gorî wê baweriyê ye, û nabe ko careke din Turk serdestiya neteweyekî din bikin, ew neteweya ko gelek setemkarî û zordestiyê ji destê Turkan dîtibe".

Nûnerê Kurd Şerîf paşa haydar dibe ko Ewropî tev bi Ermenan re hevsoj in - dibe jiber koka olî ya Ermenan be - rêkeftin û peymanekê bi nûnerê wan Boxos Nobar re û bi beşdariya serokê şandeya Komara Ermîniya û Hanciyanê re girê dide. Herdû alî bi navê gelê xwe peymanê dinavînin û diçespînin, ko gelê Kurd û Ermen di berjewendî û armanca xwe de yek in: ji serdestiya Osmaniyan rizgar bibin û azadî û serxwebûna xwe werbigirin.. Ew peyman wek doznameyeke fermî pêşkêşî encûmena bilind ya

kongir bû, û encûmen jî di serî de li ser wê peymanê erê kir. Nûnerê ramyarî yê Brîtaniya li şarê Astana ev peyman wek mizgîniyeke xweş derbirî.

Her wekî ku V. F. Mînorskî jî dibêje, “Di dema Şerê Yekemîn ê Cîhanê de, armanca diyarkirî ya dewletên hevpeyman, damezirandina dewletên Erebî bû.” Hem ji bo pêşîlêgirtina belavbûna Şoreşa Bolşevîk û hem jî ji bo petrola Mûsil û Kerkûkê, nedixwestin berjewendiyên xwe yên di vê herêmê de bixin xeteriyê û dev jê berdin.

Qîrîna Mirinê ...................................................................66

## Peymana Sêfer-Sevrê 10/8/1920an:

Di 10/8/1920an de, li Parîsê, hevbendan peymana Sêferê girêdan. Nûnerê Kurdan ê zîrek û zîrevan Şerîf paşa bi zanebûn û serkeftina xwe dikaribû sê xalan ji peymana Sêferê, yên bi doza Kurdan ve girêdayî bûn, bidê çespandin. Dewleta Osmanî bi xurtî li hember vê biryarê sekinî û her dixwest darîştina doza Kurdan wek dozeke hundirî derbas bike, û doza çareserkirina wê ji mafê xwe didît. Lê, xebata Şerîf paşa pir cihê xwe girtibû û doza Kurdan bi awayekê fermî hatibû pejirandin.

Di vî warî de Hesenê Kurd- Hişyar dibêje:

"Di sala 1920an de, di wexta hevdîtinên Sevrê de, ji bo mafên Kurd û Kurdîstanê di bin serokatiya Şerif Paşa de hey'eta Kurdên welatparêz dixwaze beşdarî hevdîtinan bibe. Parlementoya Enqerê ji bo ku hewldanên vê hey'etê bê encam bihêle, ji hemû deverên Kurdîstanê, bi peyrewên xwe, ji konferansê û

Parlamentoya Stenbolê re birûskan didine şandin. Di van birûskan de diyar dikin ku: “Şerîf Paşa û hevalên xwe nûnerên me nîn in. Em û Tirk birayên hev in, em ji Tirkan venaqetin".

"Di wê demê de waliyê Bitlîsê û Silêman Sebrî Paşa jî malmezinên wan deveran li Wanê dicivînin. Bi wan jî, bi vî rengî birûskê didine îmzekirin. Lêbelê, ji beşdarên vê civînê Xalid Begê Hesenî, Kor Husên Paşayê Heyderî û Hecî Mûsa Begê Xwêtî birûskê îmze nakin. Li ser vê meseleyê di navbera wan û Şêx Evdilayê Kufrayê de nîqaş çêdibe. Şêx Evdilayê Kufrayê radibe Xalid Begê Hesenî, Kor Husên Paşayê Heyderî û Hecî Mûsa Begê Xwêtî wek alîgirên damezirandina dewleta Ermenîstanê radigihîne. Şêx Evdilayê Kufrayê di sala 1928-an de, çaxa ku ji surgûnê dizivire, li Stenbolê di civîna surgûniyên dema serhildana Şêx Se'îd de vê yekê dibêje û xetaya xwe ya wê çaxê qebûl dike".

**Di peymana Sêferê - Sewrê de, ev xalên bingehîn grêdayî bi dewleta Kurdistana Azad 62, 63 û 64 in.**

"**Xal: 62** – Hikûmeta Ingilistanê, ya Fransa û ya Îtalyayê, her yek wê endamekî destnîşan bike û komisyoneke sêkesî ku navenda wê dê li Stenbolê be damezirînin. Berpirsyariya wê komisyonê, piştî îmzekirina wê peymanê, di nava şeş mehan de, sînorên başûrê Ermenîstana ku li Rojhelata Firatê ye, di pêş de bê kifşkirin, herweha sînorên Osmanî yên Bakûrê Sûriyê û li Mezopotamiyayê piraniya herêmên ku aleciyên wan Kurd in, li gor xala 27/II ya Peymanê, li gorî radeya 2 û 3, wê ji wan re plana otonomiya navendî bête hazirkirin. Eger li pêşberî gelşekê yekdengiya komisyonê çênebe, wê endamên komisyonê rewşê bigihînin hikûmetên xwe.

Ev pilana ku hate gotin, hemû kesên di van herêman de weke Suryanî, Kildanî û wekî din mafên etnîkên din û yên civatên olî, dê bikevin

bin parastinê. Ha bi vê amacê, wê komisyonek ji Ingilîz, Fransiz, Îtalî, Faris û Kurdan bê damezirandin ku di cih de lêkolîn bike, eger çi sînorên Osmanî be yan sînorên Îranê be, ku pêdivî bi guhartinekê hebe, li gorî naveroka peymanê dê bête kirin.

"**Xal: 63** – Hikûmeta Osmanî, ji vê demê û bi şûn de, dê weke van herdu komisyonên ku li gor xala 62yan hatine damezirandin bike, û di nava sê mehan de jî wê biryara wan bîne cih."

"**Xal: 64** – Eger tiştê ku komisyon bipeyitîne û jê bi pêş ve di nava salekê de, di nêv çarçoveya xala 62yan de, xelkê Kurd bivê ku ji dewleta Osmanî cuda bibe û serxwebûnê bixwaze, eger murace'eta Yekîtiya Neteweyên Hevgirtî bike, û eger Yekîtiya Neteweyên Hevgirtî jî bawer bike ku daxwaza serxwebûnê dê bête ragirtin û eger tewsiye bike, dewleta Osmanî jî eynî vê yekê dê bipejirîne û ji hemû nasnav û mafên xwe yên li

wan herêman jî şûn de vekişe, li wê gorê jî dê xwe ragire û erênî bike.

Xalên cudayî vê vekişandinê, wê bi peyman-besteke taybet di navbera Dewleta Osmanî û Dewletên Hevkar de bête girêdan. Piştî temam-bûna vekişandinê û piştî ku dewleta Kurdistanê jî hate avakirin, eger ev dewleta Kurd û Kurdên parêzgeha Mûsilê bi daxwazên xwe ku yekbûnê xwestin, Dewletên Hevkar li dij dernakevin."

"Peymana Sewrê ya Aştiyê, erê, hemû herêmên Kurdistanê nagire nava xwe, lê bingeha Dewleta Kurdistana serbixwe dipejirêne, ku heta îro jî ev peyman di rojeva navnetewî de, di derbasbûnê de ye! Lê Komara Tirkiyê, hêza xwe ya leşkerî bikar aniye û bicihanîna peymanê bi paş ve xistiye. Li gorî vê yekê divê ku Peymana Sewrê ya Aştiyê li gorî rastiya xwezaya Kurdistanê têkeve rojevê û têkeve nava hedefên rêxistinên Kurdistanê yên netewî".

Peymana Sêferê-Sewrê di dîroka doza Kurdî de, belgeyeke dîrokî ye. Di cîhanê de, ev cara yekemîn e ko bi awayekî fermî mafê gelê Kurd têye aşartin û çespandin. Nemaze mafê çarenûsî, ko di riya rêdan û rêbazên peymanên navdewletî re hate aşartin. Lê, Kemal EtaTurk ev peyman weha derbirî; "Ev biryara peymanê mîna fermana darvekirina Turkiyê ye". EtaTurk bi her hawî dixwest keleman jê re derxîne û vê peymanê bide rûxandin… Sed heyf û mixabin, ev peyman neçû serî. Dekûdolabî li serê Kurdan hatin gerandin, û soz û peyman hatin binpêkirin. Piştî vê qûnaxê Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd dest pê dike. Pir hêja ye ko lêkolînine pêwîst û giranbuha li ser vê peymanê bêne nivîsîn.

## Sedemên Binpêkirina Soz û Peymanan:

Li gorî baweriya min sedemên binpêkirina soz û peymanan ev bûn:

-Tirsa dewletên Ewropî, û bi taybetî Brîtaniya, ji Qomonîstên li Sofyatê ko berberiya di navbera Kemaliyan-Ewropiyan de li destê xwe bipêçin û herêmê di bin destê xwe kin, û ji ber wan bigirin, û bi serkevin.

-Turk ber bi dewleteke nûbûyî û nûjen bi encûmeneke welatî mezin ve li ser destê tevgera Kemaliyan ava dibû, û roj bi roj ber bi diyardeke geşedanî ve gav davêtin, û dûrî rêrewa kevneperistên Osmaniyan diketin.

-Paşvevekişandina Ewropiyan ji peymana Sêferê û jibîrkirin û paşguhkirina Kurdan di peymana Lozanê de, ya ko li gorî daxwaz û berjewendiyên Turkan hatibû. Ewropiyan havil û berjewendiyên xwe li nik Turkan, ne bi Kurdan

re dîtin. Ewropî bi Kurdan re ne wefadar bûn, û bê behane koldan li ser mafê wan kirin û li bazara dagîrkeran ayendeya miletekî hat firotin.

-Mustefa Kemal pirtir di hûnandina pîlanên berberiya navdewletî de canbaz û têgihiştî bû. Lewra,, dikarîbû peymana -Sêferê- tune û bin pê bike.

-Jiber gelek merc, hêman û sedemên derve û hundir yên Kurdistanê, Kurd ne li gorî pîlan û hûnandina ramyarî ya wê dem û çerxê bûn. Bêguman, guneh û kêmasiyên me jî pir bûn.

Sal û nîvek di ser peymanê re derbas nebû, doza jinûlêvegerîn hate xwestin. Diyar e ev boçûnên Brîtaniya, Fransa û Îtaliyayê jî bûn. Encûmena Bilind ya Hevbendan biryara xwe di roja 25, yenayer/çileya 1920-an de standin. Digel vê biryarê, doza şandekê ji hukûmeta Enqerayê kirin ji bo Turk beşdarî kongirê bê de bibin. Hevbendan bi vê gav û biryara xwe rewşa nuh ya Turkiyayê pejirandin.

## Serhildana Qoçgiriyê 1920 – 1926an:

Kurd ji xebata danûstendinên bi Ewropayê re bêhêvî bûn. Hindek ji Kurdan rewşa heyî pejirandin û bi serdestiya Turkan razî bûn, û hinin din ji bêgavî, dest avêtin xebata çekdarî û serê xwe ji dijmin re netewandin. Di sala 1920-an de, li Qoçgiriyê serhildanê dest pê kir. Li dora şeş salan wê serhildanê dirêj kirye. Di sala 1926an de, bi setemkariya Turkan, bi kuştin û şewitandina gundan, ev serhildan hate rûxandin. Di derbar vê serhildanê de Îsmaîl Heqî Şaweys dibêje:

"Di sala 1920ê Zayînî de, serhildana Qoçgiriyê dest pê kir, û piştî ku şeş salan ajot, li sala 1926an bi kuştina Mûrad Paşayê xayîn re kutahî lê hat. Di vê şoreşê de, gundên Qoçgiriyê tûşî talankirin û şewitandinê bûn, xelkê gundên vê navçeyê hate kuştin, jin û zarok tûşî kuştin û talankirinê bûn. Gelek ji serbazên Tirk  ku bi hoya Kemalîstan şerê wan dikirin jî, lê bi wan ne

xweş bû ku di navbera gelê Tirk û Kurd de xwîn bête rijandin, çunkî azadî û serxwebûna Kurdan li ber wan jî hêja bû, lewma jî wan nedixwest şerê wan bikin, çunkî serhildana gelê Kurd vê carê ne weke caran bû. Şoreşa Qoçgiriyê li ser heq û daxwazên gelê Kurd bû. Lêbelê, çi heyf ku Kemalîst bêwefa derketin, êrîş birin bi ser mal û gundên Kurdistanê de, piraniya wan kuştin, bi hezaran rêncber û gundî û şerkerên wan ên bê sazûman tê de tune û perîşan bûn, ku bi wan re jî gelek jê beşdarî serhildanê nebûbûn. Bi vî awayî, Tirkan bi dirindetiyê dan dû wêrankirina navçeyên Qoçgiriyê û şoreş mirandin".

"Herwekî ku me di serî de jî behs kir, Kurdên Qoçgirî û rojavayê Dêrsimê bi hev re ji bo armacên gelê Kurd ketibûn nav xebatê û ev Kurd li ser wîlayetên Erzincan, Sêwas û Elezîzê zal û desthilat bûn. Lêbelê, di wî şerê li navbera Tirkiya û Rusiya Qeyserî de xelkê vê deverê tûşî malwêranî, zirar û ziyaneke mezin bûbûn. Di vî halî de, serokên Qoçgiriyan û xelkê Elezîzê li

bajarê Stenbolê bi komeleyên siyasî yên Kurdistanê re ketibûn têkiliyê û bûbûn endamê wan komeleyan, bawerî bi hev anîbûn û alîkariya hev dikirin. Bi taybetî di nav komeleya Kurdistan Te'alî Cem'iyetî de, bihêz bûbûn û bi hev girtibûn û ketibûn nav xebatên bidestxistina mafên gelê Kurd û serxwebûna Kurdistanê. Bi taybetî ji bo bicihanîna peymana Sewrê/Sêferê ku biryara serxwebûna Kurdistana Tirkiyê û mafê otonomiya wîlayeta Mosilê tê de hatibû dayin.

Di sala 1920an de, gelek ji serokên Dêrsimê û Qoçgiriyan ji bo vê armancê ji bajarê Stenbolê vegeriyan Kurdistanê û bi hev re li navçeyên Qoçgirî û Dêrsim û Erebgirê dest bi damezirandina teşkîlatên bo serxwebûna gelê Kurd kirin. Ev li hêlekê, li hêla din jî, di sala 1919an de, Mistefa Kemal ji tirsa xîlafeta Osmanî û dewletên mezin ku êrîşî wî û hevkarên wî dikirin, bi veşarî ji Stenbolê reviyan û hatin xwe li nav Kurdan veşartin. Mistefa Kemal û Kazim Qere Bekir ê ku li bajarê Erziromê dima û

qumandanê Rojhelata Tirkiyê (Kurdistan) bû, herdu bi hev re di nav rewşeke şepirze de ketin nav xebatê, çunkî  di nav tirsê de bûn; têkçûna Tirkan li ber derî bû. Ji vê hindê, Mistefa Kemal û Kazim Qere Bekir û hevkarên wan xwe li Kurdistanê penah kiribûn; bi serok û şêxên Kurdên Erzirom, Wan, Bedlîs û Diyarbekirê re dixebitîn da ku hêza Bergiriya Millî (Millî Mûdafa) û hizbên bi vê timtêlê yên Kemalî di nav dilê Kurdistanê de deynin. Bi vî awayî bajarê Erziromê wek paytexta Kemaliyan hate zanîn. Di 23ê Temûza 1919an de, di kongir de, li pêş hemû serokên gelê Kurd ev rastî piştrast kirin, ku gelê Kurd xwedî heq e, Kurdistan welatê Kurdan e, hemû mafên gelê Kurd ên netewî hene, ku Tirkiya ji du miletan pêk tê; yanî Kurd û Tirk . Piştî kongreyê biryar dan ku herdu netewe xwedî konfederasyon bin û serbixwe bijîn, û dê li hember dijmin bi yek giyanî Tirkiyê û Kurdistanê biparêzin, eynî mîna Awusturiya û Macarîstanê".

## Kongirê London 1921ê:

Di sibata sala 1921ê de, li Londonê, kongir hate lidarxistin. Armanc ji girêdana vî kongirî; Çareserkirina pirsên mayîn yên ko bê çareserî mabûn, û ji nav wan jî pirsa Kurdî bû. Hevbendan bi şermî çareserkirina pirsa Kurdî dan pêş. Lê, hukûmeta Turkiya destmala ser rûyê wan revand û qet razî nebû, û lingên xwe dan erdê. Digotin: "Ev pirseke hundirî ye, û çareseriya wê jî wê ji hundir be. Kurd û Turk bira ne, bi dilê xwe bi hev re dijîn". Bi van gotinan Turkan dewletên hevbend bêgav dikirin. Di dema girêdana kongirê Londonê de, hukûmeta Enqerê çend rêkeftinên navdewletî jî girêdan, yên ko rêrewa nuh ya Turkiyê li gorî rêdanên navdewletî çespandin … û hukûmeta nuh hemû rêkeftin û peymanên berê yên bi hukûmeta Astana ve hatibûn girêdan tev tune kirin, û ji nav wan peymana Sêferê bû. Ev tev cihê hukûmeta Turkiyayê ya nuh xweş dikirin, û kongirê

Londonê biser neket û careke din Ewropayê hêvî û daxwazên miletê Kurd rûxandin.

Di pêşgotina K. Bîrê de hatiye:

"Di 16ê Adara 1921ê de, di navbera rêvebirên Yekîtiya Sovyet û Brîtaniyayê de peymanek tête îmzekirin. Pişt re jî, roja 20ê Çiriya Pêşîn a sala 1921-ê, di navbera Fransa û Kemalîstan de jî Peymana Anqerayê hate îmzekirin. Di Sibata 1921ê de, ji aliyê dewletên hevpeyman ve, vexwendina hikûmeta Anqerayê ji bo Konferansa Londrayê, bû gava pêşîn a naskirina hikûmeta Anqera û destpêka têkiliyên dîplomatîk ên bi dewletên rojava re. Pêkhatina rûdan û çêbûna van peymanan pêşiya tevgera Kemalîst û paşayên Osmaniyan  vekir. Piştî îmzekirina van peymanan, êdî qedera Kurdan jî diyar dibû".

"Têkiliyên Rusiya Bolşevîk û Kemalîstan/ Îtîhadciyan, ne tenê li ser kontrolkirina sînorên başûr ên dewleta Sovyetê û dijîtiya dewletên hevpeyman bû. Bolşevîkan dixwestin bi destê

paşayên Osmaniyan miletên Qafkazyayê jî terbiye bikin û wan tevî sîstema Sovyetîk bikin. Ji bo vê yekê jî, diviya bû pêşî li avakirina dewleteke serbixwe ya Gurcistan, Azerbaycan û Ermenîstanê bihata girtin. Di çarçoveya vê siyasetê de, Azerbaycan, Gurcistan û Ermenîstan bi destê Kemalîstan/Îtîhadciyan hatin terbiyekirin û di van welatan de desthilatdarî kete destê hevalbendên Bolşevîkan. Rêveberiya Rusiya Bolşevîk bi îmzekirina van peymanan, armanc û prensîbên Enternasyonala Komonîst, bi pêdivî û esasên polîtîka derve ya dewleta Yekîtiya Sovyetê ve girêdan. Jiber vê yekê, Bolşevîkan bê şert û bê sînor piştgiriya Kemalîstan kirin".

"Li Iraqê, di Tebaxa 1921ê de, Rêveberiya mandaterî hate damezirandin. Faysal bû qiralê Bexdayê. Lêbelê, pevçûnên navbera Kurd û Ereban de nehatin rawestandin, her ku diçû zêdetir û dijwartir dibûn. Jiber vê yekê İngilîzan, di Çiriya Pêşîn a sala 1922yan de, Şêx Mehmûd Berzencî ji Hindisatanê vegerandin û di

çarçoveya otonomiyeke teng de ew kirin serokê Kurdistanê. Lêbelê, di sala 1923yê de, dema ku İngilîzan xwestin otonomiya Kurdistanê bi navenda Iraqê ve girê bidin, Şêx Mehmûd ev yek qebûl nekir, û di sala 1924an de, dîsa şerê Kurd û İngilîzan dest pê kir. Di dawiyê de, Kurdistana Başûr, bi biryara cem'iyeta Miletên Yekgirtî ji bo mandateriya İngilîzan tête hiştin û paşê İngilîz jî Başûrê Kurdistanê bi Rêveberiya Iraqa Ereb ve girê didin".

## Peymana Lozanê 24/6/1923an:

Ramana girêdana peymana Lozanê, ji serkeftinên mezin yên hukûmeta Turkiya li ser supahên yûnanan "1921-1922" pêk hat. Lewra, hate diyarkirin ko Turkiya xwedî dewleteke ciwan û bi hêz e. Di cih de, danûstendin û têkiliyên xwe bi Yekîtiya Sofyêtê re xweş kirin.

Di peymana Lozanê de hatiye ko "Turkiye sozê dide bi parastina tevaya nişteciyên xwe, û dana azadiyê bê alî û cudayî ji tevan re". lê, mixabin bê ko navê Kurdan bê gotin, yan peymana Sêferê bê nîşankirin, yan jî li ser bê rawestandin. Dîsa û careke din hêviyên Kurdan hatin rûxandin û soz û peymanên hevbendan li ber ba çûn, û dekûdolabiya wan dagîrkeran pişta miletê Kurd şikand. Ew ji azadî û serxwebûnê bêpar kirin, ji mafê wî yê mirovî, ramyarî, civakî, rewşenbîrî dûr hiştin... û fermana bidarvekirina wî miletî dan. Li ber dîroka miletê Kurd dewletên hevbend tev gunehkar in, lê yê gunehkartir

Brîtaniya ye. Brîtaniyayê di 16/12/1925an de, wîlayeta Mûsilê jî bi ser xaka Îraqê ve berda û careke din neheqî li Kurd û Kurdistanê kir.

Di vî warî de Z. Bozarslan, di "Nerînek li Dîroka Kurdîstanê" de dibêje:

"Di sala 1923yan de, di hevdîtinên Peymana Lozanê de, behsa Kurdistanê û mafên Kurdan ên netewî qet nayê kirin. Hukûmeta Tirk ji bo hewldana welatparêzên Kurd bê encam bihêle, raya giştî ya Ewropayê û Dewletên Hevpeyman jî dixapîne. Hey'etek ji parlamenterên xwe yên Kurd bi Îsmet Înonu re dişînin Lozanê. Îsmet Înonu di van hevdîtinan de, xwe wek nûnerê Tirk û Kurd dide nîşandan. Ev hey'et ji parlemanterên wan ên Amedê Birincçizade Feyzî, Zulfî Beg û parlamanterê wan ê Swêregê Xelîl Fexrî tê pêkanîn. Qaşo serokê hey'etê jî Xelîl Fexrî ye. Hukûmeta Tirk vê hey'etê beşdarî hevdîtinan dike. Xelîl Fexrî ji bo ku beşdarî hevdîtinan nebe, xwe li nexweşiyê datîne. Her du nûnerên

din di civînê de dibêjin: "Em û Tirk  birayên hev in, em ji Tirk an venaqetin".

Diyar e, ev narevîna gelê Kurd e, ko ne bes bû di nav du dewletan de parkirî bû, belê di roja îro de, di nav pênc dewletan de, Turkiya, Îraq, Îran, Sûriya û Rûsiyayê de hate parçekirin. Ji wê rojê ve, roja peymana Lozanê, jiyana gelê Kurd tev hate guhertin, mirovê Kurd di hundirê xwe de hate bidarvekirin, lawazkirin û kuştin, çi di warê ramanî, mejî û hizra mirovî de be, û çi di warê civakî, ramyarî û rewşenbîriyê de be. Kurd di welatê xwe de bûn biyanî. Ev peyman bû mîna rojeke reş di dîroka gelê Kurd de. Tiştê pir bi min giran e, ez nizanim bê çima gelê Kurd, tevger û rêxistinên wan, her sal di vê rojê de, roja reş, roja peymana Lozanê, wek rojeke reş di bîra xwe de nayînin!? Di baweriya min de, serê sedeman û serê malwêraniya Kurdan ji vê qûnaxê, ji vê peymana reş dest pê kirye. Pir girîng û pêwîst e, li ser hemû rewşên derbasbûyî: sedem, nakokî, berberî, berjewendî, gunehkarî,

bêsincî, neyekîtî û xiniziya Kurdan, canbaziya Etaturk û bêsoziya hevbendan bêye rawestandin û şirove kirin. Ez bawer im bi awayekî giştî li ser hatiye sekinandin. Lê, peyva min ne ew e. Peyva min ev e ko dîroknivîs, ramyar û ronakbîrên Kurd bi mejiyekî Kurdî temîz, bi ramaneke neteweyî Kurdî wan hoy, hêman û boçûnan ji nû ve naveçirînin, narêsin û nahûnin?!.

Piştî vê peymanê, qûnaxa tevger, komele û şoreşên Kurdî dikeve çerxê; Tekoşîneke bêhem-pa, kêşeke dadmend û pêkanîna mafê çarenûsî yê Kurd û Kurdistanê.

Mazhar DUDERÎ dibêje:

"Piştî îmzekirina Peymana Lozanê, di 29ê Cotmeha 1923an de, Komara Tirkiyê tê îlankirin, û hebûna Kurdan jî tê înkarkirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên Kurd li Erziromê di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê **Komîteya Îstîqlala Kurdistanê** yan jî

**Tevgera Azadî** rêxistineke siyasî dadimezirînin".

"Piştî Peymana Lozanê hukûmeta Tirk desthilatdariya xwe li hundir tekuz dike û hebûna Kurdan jî înkar dike. Lêbelê, Tevgera Azadî jî xebata xwe berfireh dike. Li gelek deveran liqên tevgerê têne avakirin".

Mazhar DUDERÎ dîsa dibêje:

"Piştî danîna Komara Tirkiyê di sala 1924an de, cara duyemîn parlamentoya Tirk ku dicive, mafê Kurdan ji binî ve înkar dike. Li ser vê rewşê, mezinên Kurdan bi hev dişêwirin. Ji bo ku Şêx Se'îd mirovekî rûhanî ye, dixwazin wî bikin serokê tevgerê. Di sala 1924an de Xalid Begê Cibrî, Xalid Begê Hesenî û Yûsiv Ziya têne Qolhesenê (gundê Xinûsê - gundê Şêx Se'îd) cem Şêx Se'îd. Vê teklîfê li wî dikin. Ew jî vê teklîfê qebûl dike. Qasim jî bi wan re ye. Jiber ku Qasim mûxbir e, van têkiliyan roj bi roj rapor dike. Piştî

ku hukûmeta Tirk  Xalid Begê Cibrî û Yûsiv Ziya digirin, dixwazin ku Xalid Begê Hesenî û Şêx Se'îd jî bigirin; Lêbelê, ew xwe nadin dest".

"Tevgera sala 1925an ku bi navê tevgera Şêx Se'îd tête nasîn, ji aliyê Komîteya Îstiqlala Kurdistanê (Azadî) ve hatibû damezirandin. Hikûmeta Anqera, ancax bi piştgiriya Rusiya Bolşevîk, Fransa û Îngiltere tevgera Kurd a 1925an jî pûç kir. Tiştê balkêş ew e, ku rêvebirên Komîteya Îstiqlala Kurdistanê (Azadî) û serokê tevgera başûrê Kurdistanê Şêx Mehmûd Berzencî, ji bo ku rêvebirên Yekîtiya Sovyetê piştgiriyê bide tevgera Kurd, bîzatîhî ji Lenîn re nameyan bi rê dikin û di nameyên xwe de dibêjin "Em amade ne ku qedera gelê Kurd bi qedera gelê Sovyetê ve girê bidin." Lê mixabin rêvebirên Sovyetê, tenê qîma xwe bi piştgirînedana tevgera Kurd nayînin, berevajî daxwaza vî gelê bindest, piştgiriyê didin dewletên dagirker. Û tevgera neteweyî ya Kurd, "Bi hevkariya dewletên

emperyal tête tawanbarkirin û wek tevgereke dijî şoreşa Sovyet û Tirkiyeyê tête îlankirin."

"Ji bûyer û têkiliyên ku heta nûha hatin diyarkirin, der tê holê ku rejîma Kemalîst bi piştgiriya emperyalîst û Bolşevîkan bi ser ketiye, ne ku dijberiya wan kiriye. Her wekî ku ji aliyê berdevkên îdeolojiya fermî ya dewletê ve tête îddîakirin, ku tevgera Kemalîst yan jî “Mûcadeleyê Mîllî”, ne encama serkevtina şerê “dijî-emperyalî” bû. Berevajî wê, bi erêkirina hêzên emperyal ên serdest, bi destê paşayên Osmaniyan li ser baqiyeya Împeratoriya Osmanî, di şiklê “dewlet-netewe” de damezirandina komareke “otokratîk û dîktatorel” e. Lewra, rejîma Kemalîst, ne li ser bengehê îdeolojiyeke xwerû û berxwedanê, li ser “radestiyeke pragmatîst û otokratîk” hatiye avakirin. “Mûcadeleyê Mîllî”, li hemberî gelên Anatolya û Mezopotamya Jorîn, têkoşîna serdestkirina nasnameya etnîkî ya Tirk e. Di vê çarçoveyê de heman demê “şerekî navxweyî” ye. Tevgera Kemalîst, berdewamê

tevgera Jon-Tirk û Îttîhad-Teraqî ye. Çavkaniya ku tevgera Kemalîst jê peyda bûye, ne tenê dîktatoryel û cuntaparêz e, herweha nijadperestên Tûranî ne jî."

# Gelo Çima Kurd Nebûn Xwedî Dewlet!?

Ez bawer dikim ev pirsiyar di serê her mirovekî Kurd de digere û diçe û tê. Min jî nexwest nivîsa xwe bê bersiv bihêlim û pişta xwe bidim we, de ka em bi hev re li ser van xalên jêrîn hindekî rawestin:

Di dîroka Kurdistanê de, Kurd xwedî pir mîrîtiyên/mîrnişînên serbest û serbixwe bûn. Wan li ser xaka Kurdistanê dewletên herêmî damezirandin. Piştî nîvê didiwan ji babilîska dehan ya zayînê –serdema Îslamî – çend dewletên herêmî weke dewleta Şedadî, Hesnewî, Merwanî, Zengî û Imperatoriya Eyûbî-Islamî. Di babilîska hejdehan û nozdehan de jî, pir mîrnişî-nên/mîrîtiyên mîna Erdelan, Badînan, Soran, Baban, Hekarî, Botan, Bedlîs û xanedanên wê û serhildana Şêx 'Ubeydullah hebûn. Lê mixabin, Kurdan wê demê nikaribûn, li seranserî Kurdis-

tanê dewleteke mezin û navendî damezirînin. Jiber vê yekê dewletên herêmî pêk hatin.

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, û ji bo avakirina dewleteke Kurdî serbixwe, pêwîstî bi gelek hîm û hêman û xelekên dîrokî hebû, mîna libên tizbiyê li pey hev rêzkirî, hevgirtî, bi yek tayî ve, û bi pêşewayekî hêmin hebû.

Bêdiro! Hebûna pirmîrîtî û neyekbûna xanedan û fermandarên Kurdan, rolek sereke di çarenûsa paşeroja wan de lîst. Lewra, ev rastiya rewşa wan - parçebûn û dijayetî - bû bela serê wan. Tewr û terza pergala wan mîrîtî û axatî bû. Herkes ji xwe re bû, û yekî xwe bi yê dî nedida. Tev payedar û pozbilind bûn. Ne hêza navenda biryara Kurdî, ne jî berjewendiyên hevbeş di nav wan de hebûn ko, berberî û nakokiyên xwe jibîr bikin û bigihin hev û hev ragirin. Mixabin, tev bi mejiyekî nadar, nezok û nîvreng paldêr bûn. Li ber siya vê rastiyê, navenda bi hêz û hevgirtî ya Imperatoriya Osmanî û Sefewiyan li pêş bû. Li

ber vê rastiyê, ne derfet û ne karîna dameziran-dina dewleteke bi hêz û yekbûyî nebû. Lewra,, mîrîtiyên Kurd bi sedemên xwe yên ramyarî, cuxrafî, hundirî û pir navxweyî şikestin, û evê rewşê bandora xwe li paşeroja wan di babilîska bîstan de kirye.

Piştî ko Imperatoriya Osmanî dawiya wan mîrîtiyan anî, tu guhertin di navbera  qûnaxa nîva babilîska nozdehan û Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, û bi taybetî di warê civakî û aborî de, li herêmên Kurdistanê nebûn.

Lewra, di dema ko herêma Rojhelata Navîn bi tevayî li ber guhertinên ramyarî bûn, evê yekê barê merovê Kurd girantir kir. Ji bo yekbûn û pêşxistina komelê, pêdivî bi hîm û hêmanên nû hebû. Ango, pêwîstî bi hêmanên hebûna dewle-teke ramyarî serbixwe û aboriyeke geşedanî hebû. Mixabin, civaka Kurdî sist û jihevketî mîna piraniya civakên Rojhelata Navîn bû. Ango, hêmanên komelê yên ko akama xwe li

hêmanên dîrokî hiştibû, dawiya dawî roleke berz û diyar di hilweşandina Kurdan de lîst.

Mîr û xanedanên Kurdan ne kuldar û xemxurê milet bûn, belê tev kuldar û miriyê kesayetî û hoza xwe bûn. Tev ne xwedî helwesteke neteweyî ye zelal, armanceke pendî, çemek yekbûyî, xwedî bîrûbawerî û ji bo paşerojeke azad û serbixwe bûn. Digel ko tevan li ber çavên xwe didîtin ko roj bi roj mîrîtiyên Kurdan bi destên dijmin tên rûxandin, lê qet rojekê hizir û ramana yekirin û yekbûna êl, hoz û şervanên xwe yên çekdar di bin alayekê de bigihînin hev û hevragirin nebûn.

Evê yekê dilê dijminê wan hênik dikir. Lê, ez bawer im ko rola mezin ya dijmin bû. Divê em jibîr nekin ko rewşa hêza Kurdan û hêza dijminên wan ne di yek terazû û pêwaneyê de bûn. Kurd bê pişt û ne havçerxê ramyariya demkî û demdirêj bûn. Ew ne xwediyê çemekê lec û zîrekê danûstendinê bûn. Kurd wekî netewe

bêdewletbûyîna xwe tiştekî normal pejirand. Kurdistan bûbû meydana şerê herdu Imperatoriyên Osmanî û Sefewiyan, û Şerê Cîhanê yê Yekemîn aliyê sisiyan ji bo têkilî û berjewendiya avakirina dewleteke Kurdî peyda nebû. Kurdistan ma cihê ko her kesî ya xwe tê re didît, û dewlemendiya wê, petrola wê, serxak û binxaka wê tev bû bela serê wê.

Qîrîna Mirinê ..........................................................................96

## Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Ermen:

Miletê Ermen yek ji miletên kevnar e ku di herêma Rojhelata Navîn de dijîn. Yekemîn dewleta Ermenî di babilîska şeşê B.Z de hatibû damezirandin. Ew xwedî şarestaniyeke geşedanî bû. Di sedsala çaran de, ayîna Mesîh di nav Ermenan de belav bûye. Zimanê Ermenan Hindo-Ewropî ye. Dîroka Ermenan jî mîna dîroka Kurdan e ko, ji mêj de tu serxwebûn û rehetî nedîtine; ew her bindest û parçebûyî jiyaye. Ji dema Roman, Sasan, Bîzentî û Dewleta Erebî-Islamî, Selcoqî û heta şerê Osmanî-Sefewî, ev milet bindest û perîşan bû. Di sala 1639-an de, Ermînya dibe du beş, beşê Rojhelat di bin destê Sefewiyan de, û beşê Rojava di bin destê Osmaniyan de mane. Berî Ermîniya bi sedsalî, Kurdistan di navbera Sefewî û Osmaniyan de parçe bûbû. Di salên 1826-1828an de, Ûris zora Eyraniyan birin. Bi peymana (Tirkman Çay) ya sala 1828, Ermîniya Rojhelat bû parçak ji xaka Rûsiyayê. Di sala 1887-an de, partiya Hinçak bi

destê çend xwendevanên Ermen li Cinêvê, û di sala 1890î de, partiya Taşnaq bi destê Berciwaziya neteweyî ya Ermen hatin damezirandin. M.S.Lazarêv dibêje: "Di wê demê de, (dema komkujiyê) Taşnaqan pir ziyan gihandin miletê Ermen, jiber ko miletê xwe ber bi raperînekê dehfdan berî ko dema wê bê, û di zikê xelkên xwe de dijminatî û dilreşî li dijî Kurd û Turkan tevan diçandin". Ji hêlekê din ve, Dr. Erotonyan dibêje: "Ji dêvla ko partiyên neteweyî-demokratî yên Ermen hêzên democrat yên gelê Kurd wek hevkar û dost bidîtana û bi wan re tekoşîna rizgariyê li dijî derebegên Turk û Kurdan kar bikirana, mixabin şerê ayînî û olî kirin. Dîwarek di navbera herdû miletên Ermen û Kurd de lêkirin. Mixabin, ev ramyariyeke ne berpirsiyar lê xwekuj bû. Wan tenê daxwazên qatên derebegên Turk û Kurdan pêk anîn".

Ji mêj ve, têkilî û danûstandin di navbera herdû miletên hevsînor Kurd û Ermen de hebû. Mixabin, herdû milet (Ermen û Kurd) pir

setemkarî, dijwarî û nexweşî ji Şahên Sefewî û Sultanên Osmaniyan dîtin.

Çi dema şer di navbera Ûris û Osmaniyan de dest pê kirye, Ermen li hêla supahên Ûris diman û şer li hemberî Osmaniyan dikirin. Çavê Rûsiya li parçê dî ji Ermîniyayê bû. Ev pêrewiya Ermen ji Ûris re gelek fermanên komkujiyê bi serê xwe anîn, nemaze komkujiya sala 1915-an, ya ko bi deh hezaran ji wan hatin kuştin, talankirin, û gelek gund û malên wan hatin şewitandin. Ji sedî 90% ji wan kesên ku ji mirinê jî reha bûn, ew jî bi alîkariya miletê Kurd bû. Kurdan roleke baş di veşartin û parastina xelkên Ermen ji komkujiyê lîstin. De ka em bi hev re derbasî vê rewşê bibin, bi xweşî û nexweşiyê xwe ve, bi talî û şîrîniya xwe ve, bi pîlan û fûtên wê ve û bi dekûdolabên wê ve, ko çawa herdû milet bûn qurbana nezanî, şaşîtî û berjewendiyên dewletên mezin di cîhanê de.

Îsma'îl Heqî Şaweys dibêje:

"Li gor Çardeh Prensîbên serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Wilson, amerîkî û İngilîz û fransizan soz dabûn Ermenan ku dewleteke mezin û ferawan ku ji Erîwanê bigire hetanî bendergeha Eskenderûnê, ku xwe digihêne keviyên Deryaya Spî, ji wan re ava bikin. Ji berê de van dewletan bi hukûmeta Daşnaq a Ermenîstanê û hukûmeta Misawat a Azerbaycana Qafqasiyayê û bi Gurcistanê re hev girtibîn û ji bo vê mebestê hevkarî dikirin. Li Qafqasiyaya Ermenîstanê sînorên Tirkiyê û Rusiya yê li pêşiya serxwebûna Ermenîstanê asteng bûn; lewma jî biryar dabûn ku leşker û artêşên wan li hember Tirkiyê û Yekîtiya Sovyetên Rûsiya dê xwe amade bikin. Derbarê viya de, di Cenga Yekem de, serok û giregirên Ermenîstanê ji dewletên Ewropayê û ji Amerîkayê doza alîkariyê kiribûn û wan bi hev re li dijî selteneta Osmanî hevkariyê dikirin. Belam herçendî gelê Kurd hez ji nexweşî û dolabgerandinên gelê Ermen

nedikir, lê nedixwest zilm û zorê jî li wan bikin, herwiha, li sala 1914-15ê, dema ku hukûmeta Osmanî (Îttihad we Teraqî) êrîş bir bi ser Ermenan de û dest bi kuştina wan kir, hingê gelê Kurd destê hevkarî û alîkariyê bo gelê Ermen dirêj kir. 30 hezar Ermen bi jin û mêr, mezin û piçûkan ve li gund û bajarên gelê Kurd xwe dan veşartin, gelê Kurd jiber Tirkên dirrinde şeref û namûs, can û malê Ermenan parastin. Belam, digel vana gelê Kurd bi xwe jî têdikoşiya û herçend mafê serxwebûna gelê Ermen li bal Kurdan pir xweş bû jî, lê Kurdan jî nedixwest li jêrî destê Tirkan dîl bimînin yan bi destê Ermenan bigirin û dîl biçin yan jî dîlîtiya Ermenan bi dîlîtiya xwe re biguherînin. Jiber van hoyan bi rastî û durustî gelê Kurd jiber van pîlan û tevgerên Ermenîstaneke mezin û ferawan neçar bûbûn û vê yekê li ser hesabê gelê Kurd şepirzeyî anîbû ber derî. Serok û komele û komîteyên siyasî û civaka gelê Kurd li Stenbol û Anadolê û li Kurdistana Tirkiyê bi eşkerayî yan

jî veşarî xerîkî xwe rêxistinî bûbûn; dawakar û parêzgarê Kurdistanê bûn. Ji bo vê mebestê bi İngilîz, amerîkî, fransiz, îtalyanî û yewnaniyan re têkilî danîbûn û ji bo mafên gelê Kurd ên dîrokî dawakar bûn, ku di dabeşkirin û parçekirina Dewleta Osmanî de Kurdistan neyête dabeşkirin û dîlkirin û parçe-parçe nebe.

Wek ku me got, meseleya Kurdistanê û Ermenîstanê bi hev re derketibûn holê û gelê Kurd metirsiyek peyda kiribû. Bi taybetî di nav Kurdên Erzirom, Wan, Bedlîs û Diyarbekir meseleya Ermenan jî tirsek çêkiribû, çunkî li Erîwana Qafqasan komareke bi hêz pêk hatibû û dewletên mezin piştgîriya wan kiribûn. Dîsa, komarên Azerbaycan û Gurcistanê li dijî Rusiyaya Sovyet û Tirkiyeya Osmanî bi komara Erîwanê re hevûdin girtibûn û êrîşî Kurdan û Tirkan dikirin. Ji aliyekî din jî, bi wan re, siyasiyên İngilîz û Fransiz û Amerîkî ji bo pêkanîn û bicihkirina peymana Saykis-Bîko li Erzirom û Sêwas û Meletiye û Erebgirê ji bo

qezenca xwe li dijî gelê Kurd di nav tevgerê de bûn, li Helebê û li tevayî Sûriyê ji bo zindîkirina projeya Cester a ku ji bo qezenca dewleta Amerîkayê dixebitî, di nav tevgereke eşkera de bûn. Ji vana jî wêdetir, şîrketên Amerîkayê ji bo madenên Kurdistana Tirkiyê û ji bo kirîna neftê, li bajarê Erziromê bi general Kazim Qere Bekir Paşa re di nav guftugokirinê de bûn. Û dîsa, ji bo vê amacê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) li bajarê Stenbolê di binî re alîkariyê didan kemalîstan".

Ûris bi zanebûn damezirandina welatekî neteweyî li ber guhê Ermeniyan dixist, û ji bo berjewendiya xwe çend hêzên çekdar ji Ermenên Taşnaq çêkir. Ermen jî bi hêviya ko bibin xwedî welatekî neteweyî, li gorî sozên ko dihatin dan û nemaze pişta xwe bi Ûris ve girêdidan, hemû ûşt û mercên wan jî dipejirandin. Ûris bi dekûdolabî li têla ol û ayînê dixist û Ermenan jî bawer dikirin!. Lê, di baweriya min de, pirsgirêk ramyarî ne olî bû. Di rastiya wê de, herdû milet

Kurd û Ermen bûn qurbana lîska dewletên mezin û berjewendiya wan. Dewleta Osmanî jî mîna Ûris ol di berjewendiya ramyariya xwe de bikar tanî. Lê, her yek ji wan bi awayekî û li gorî ramyariya xwe dipeyîvîn. Ji vê nama M.Kemal xweş diyar e: "Dema ku M. Kemal li Samsunê ye, ji bo hinek serokeşîr û şexsiyetên Kurd têlgiraf û nameyan dişîne û dibêje, “Ez ji aliyê Sultan ve hatime wezîfedarkirin, di nav demekî kurt de ezê werim ziyaretiya Kurdistanê. Îngiltere dixwaze Kurdistana serbixwe qurbanê berjewendiyên Ermenan bike, lê hun dizanin ku Kurd û Tirk birayên hev in, ji bo hebûna me, îhtiyacî bi Kurd û Tirk û hemû misilmanan heye. Ez bi xwe, bi şertê ku Dewleta Osmanî parçe nebe, dixwazim hemû îmtiyaz û hiquqê ku bibe wesîleyê geşbûn û pêşketina Kurdan, bête qebûlkirin.”(Ayşe Hürr, rojnameya Taraf)".

Di sala 1915an de, Ûris berê supahên xwe ber bi dewleta Osmanî ve ajot, û bi rêberiya hêzên Ermeniyan derbasî xaka Kurdistanê bûn.

Supahên Ûris û hêzên alîkar yên Ermen dest bi kuştin û talankirinê kirin. Bihaneya vê kuştinê jî ew bû, ko Kurdan di herêmên xwe de, di şerê Rûsiya-Osmaniyan li alî dewleta Osmanî ya misilman sekinîne. Ûris xwe wek xwediyê ola Xiristiyanî diyar dikir. Bi mal, zêr û çekan alîkariya Ermenan dikir. Ûris mal û milk, erd û zeviyên musilmanan bi darê zorê ji wan distandin û didan Ermenan. Ji teresî û bêsinciya wan, destên xwe dirêjî jin û keçên Kurdan dikirin. Nûçe û salixdanên kuştin, talan û wêranên Ûris û hêzên Ermenan li Kurdistanê, li nav Kurdan belav bûn. Lewra, Kurd ji bajar û gundên xwe reviyan û derketin. Jiber vê bobelatê, qûnaxa mihaciriyê di nav Kurdên wan herêman de dest pê dike.

Supahên Ûris herêmên Kurdan dagîrkirine heta bi serketina şoreşa Belşefî li Rûsiya sala 1917an.

Ji hêleke din ve, Şoreş Zîrek di gotara xwe de: Genosîda-Qatlî'ama- Ermeniyan weha dibêje:

"Bi biryar û plan komkujiya Ermeniyan rêvebirin wê rejîma nijadperestên Tirk Îttihad Terakî kirine. Bi fermana Sultan Evdilhemîd di nav hinek eşîrên Kurdan da **Alayên Hemîdiye** wek Qozaxên Ûris pêkanîn û çekdar kirin ku li hember Kurdan, Ermeniyan, Kurdên Êzdî û Kurdên Elewî, her weha li hember Ûrîsyeta Qeyserî şer bikin. Alayên Hemîdiye di bin fermandariya artişa Osmanî da bûn, ew ne serbixwe bûn. Ew Alayên Hemîdiye ji bo parastin û aramiya navxweyî ya Împaratorya Osmanî da bûn. Sultanê Osmanî bi avakirina Alayên Hemîdiyê neyarî di nav eşîrîn Kurd û Ermeniyan da çêkir û zirar dan Ermeniyan him jî dan Kurdan. Kurdistan di terefê Împaratoriya Osmanî da dagirtî (kolonî) bû û Kurd ji ne azad bûn. Jiber vê yekê ye ku bi tevayî gelê Kurd ne hevparê qatlîama gelê Ermenî ne".

"Kurd, Ermen, Keldan û Suryanî gelên cîwarên herêma Rojhelatê Navîn in. Ew netewena bi hezarsalan li vê heremê wek cîran jiyane. Bi taybetî Kurd û Ermenî wek hemû gelên cîran, car caran di nav wan da şer û gengeşiyên biçûk qewimîne. Lê ew gelena di nav xweşbînî û aştiyê da bi hevra jiyane. Ew herdû millet û etnikên din wek Suryanî û Keldanî bi gelek awayî tesîra wan li ser hev çêbûne. Bi taybetî di jiyana ciwakî de gelek tiştên wan yên hevpar hene. Li hember dagirtina welatên xwe wan bi hevra têkoşîna rizgarkirna axa xwe kirine. Dema Împaratoriya Osmanî û derebegên herema Xarpêtê êrişî dibirin ser Ermeniyan, ew koçberê herema Dêrsim dibin. Li herema Dêrsimê bi hevra li dijî êrîşên artêşa Osmaniyan berxwedan dikin. Dîsan di wê demê da artişa Osmaniya mazota ku ji Behra Reş tênin ku Xozatê, daristan û gundan bişewîtinin, Ermenî pêşgiriya Kurdên Dêrsimê dikin û berxwedanek mêrxasî li hember artişa Osmaniyan didin. Di romana nivîskar

**Andranik bi navê Dêrsimê** da em berxwedanên li dijî artêşin Osmaniyan bi serbilindî dixwînin. Di genosîda Ermeniyan li herema Xarpêtê di terfê Teşkîlati Mahsûse dest pê dike, gelek Ermenî dîsan jiber terora nijadperestên Tirk xwe davên bextê herema Dêrsimê û hinek ji wan bi alikariya Kurdên xwedî kesayetî û bi wûjdan Ermeniyên belangaz ji qatlî'amê xilas dikin, alikariya wan dikin ku xwe bigihînin binêxetê. **Metin Aktaş** di romana xwe ya bi navê **Heyaletên li Xarpêtê-Harputaki Hayalet-** hûrgilî li ser bûyerên qetlî'ama Ermeniyan li herema Xarpêtê ku di aliyê Teşkîlatî Mahsûse hatiye kirin dinivisîne".

Di 24/4/1915an de, dewleta Osmanî fermana Ermenan rakir. Bihaneya Osmaniyan jî ev bû ko "Ermen ne bi nan û xwê ne, alîkarî û pişta dijminê welatê xwe girtine, ew sîxur in". Osmanî bi setemkarî û pir dijwarî li Ermenan dixist. Welat serûber li hev ket û geremolî bû. Dem dema şer bû. Birçîbûn, nexweşî, xizanî û kuştin

pir bû. Helwesta Kurdan li hemberî vê kuştina Ermenan ev bû: Kurdan bi mihderî û dilovanî kuflet û zar û zêçên wan li malên xwe vedişartin û wan ji mirinê diparastin. Lê, hin ji Kurdan ew Taşnaqên sîxur û kuştkar derbasî malên xwe nedikirin û xwedî li wan dernediketin. Lê mixabin, dewleta Osmanî ev pirsgirêk bi xwînê reha kir. Ramyariya wê ev e ko li hêlekê –zo-ango Ermen bikuje û li hêla din –lo-ango Kurd bikujin. Jiber vê fermana bê nihad ya ko Osmaniyan li dijî Ermen û Kurdan bikar anî, ew li dunyayê belav bûn. Sed heyf û mixabin Ermen li vê ramyariyê varneqilîn û bi "kerê nikaribûn berê xwe dan kurtan".

Ebdurezaq Bedir-Xan yek ji wan kesên ku di wan bûyerên Kurd-Ermen de jiyaye û bi çavên serê xwe dîtiye. Bi nihadî bûyer bi bûyer , bê dudilî, weke bûye, li ber çavan raxistiye.

Ebdurezaq Bedir-Xan di pirtûka xwe de ya bi navê –Autobiyografiya Ebdurrizaq Bedirxan- wergera:

Celîlê Celîl - weşanên kovara Metîn 11-1999 Duhok - Rû, 47 - de dibêje:

"Gava min bihîst ku Diro, Serokê hêza Ermeniyan bû, bi 300 merivê xwe ve hatiye Kêvêrî-şamyanê, min Kurd dane bawerkirinê da ku jê netirsin, çimkî weku ez pê bawer bûm, ji Ermeniyên ku tevî Rûs diçûn, mera bingeha tirsê tunebû. Lê gava melle bi nan û xwê derketibû pêşiya wana, (Ermen) ew mîna berxikê serjêkirî bûn. Pey vê ewana daketibûn nava gund, bi singuyê serê tifingên xwe heşt kufleta û zara kuştibûn. Gava Kurdên Ebaxê li ser vê kuştinê bihîstin, çûne ser Kêvêrî-şamyanê û hêrîş birin ser Diro, ew birîndar dikin û ew mecbûr bû bi çetê xwe ve şûnda vegere".

Ebdurezaq Bedir-Xan -Rû53- de dibêje:

"Ji aliyê dinê va Ermeniyê ku bi rezadilî bibûn leşker, gava ji Kotûrê derketin, 270 mêr, jin û zarokên Kurda kuştin, keçik bi xwe ra birin, gund şewitandin, pez û dewarê wana talan kirin. Hûrgilî ser vê kuştarê mîr (Knyaz-C.C) Garab-xadzê, parûçîk Îvanov (ji hêza peya ya pênca),

Kapîtan Platonov (ji hêza 8an) û merivên mayîn, yên ku van hemû tişta bi çavê xwe dîtibûn, gihandine min".

Mamoste Siddîq Bozarslan dibêje:

"Wek wesîqe, Pirtûka Garo Sasunî ya bi navê ”Bizavên Neteweyiya Kurd û Têkiliyên Kurd-Ermen, Ji sedsala 15´an ta îro” çavkaniyeke baş e. G. Sasunî bi xwe Ermenekî ji Sasunê ye û alim û siyasetmedarekî wê dema qirkirinê jiyaye. Min li jêr çend mîsal di vî derbarî de ji pirtûkê destnîşan kiriye".

"Li gorî Garo Sasûnî, Komkujiya Ermenan a ku di havîn û payîza 1895´an de destpêkir; 300.000 Ermen qirbûn û piştî wê qirkirinê ji birçîbûn û nexweşiyê jî gelek Ermen mirin û hin jî di encama guhertina dînê xwe de ji mirinê xilas bûn. (Binêre, Garo Sasunî, Pirtûka ku li jor min navê wê nivîsandibû (pmnn), R.118, Weşanxana Orfeus Stockhom 1986)

G. Sasunî: ”…eger ji tifaqa ku Şêx Ubeydullah çêkiribû nebûya û fitwaya Şêx a ”ji komkujiya Ermenan dest vekêşin” nebûya, felaketên mezin ku di 1895´an de çêbûbû, dê ew di sala 1880´yî de mezintir çêbibûya.” Ji G. Sasunî mirov tê digihîşe ku Bizava Neteweyî ya Şêx Ubeydullah, digel Ermenan tifaq pêkaniye û li herêma ku hukmê wî hebûye Ermen nehatine kuştin. Tifaqeke weha di navbeyna Bedir-Xan Beg û Ermenan de dîsa pêkhatiye û Mîr Bedir-Xan jî Ermenan parastiye. Ev du mîsal û gelek mîsalên dî jî hene ku Sasunî behsa wan dike, nîşan didin ku li herêmên ku hukmê Kurdan hebûne, gelê Ermen nehatine kuştin û dostanî û tifak di navbeyna du gelên cînar de, demên dirêj hatine domandin".

"Li gorî lêkolîna G. Sasunî, di encama komkujiya Nîsana 1915´an de, ji milyonekî zêdetir Ermen hatine qirkirin, 20.000 Ermen ji aliyê Dêrsimê ve hatine parastin. Li herêma Modikan a Mûşê jî bi saya serê Malbata Şêxo

12.000 Ermen ji kuştinê xilas bûne. Gelek serokeşîrên Kurd di salên 1915-1917´an de, Ermen xistine bin bandrola xwe û wan bi cil û bergên Kurdî veşartine. Ev serokeşîr paşê ji aliyê nîzama Osmanî ve hatine cezakirin. Divê were gotin ku eşîretên Başûrê Kurdistanê jî Ermenên ku xwe avêtibûn bextê wan, ew parastine. Li gorî lêkolîna Rohat Alakom ku di jimareya 45an a Kovara Bîrnebûn´ê de derçûye, xûya dibe ku (Rûpel 10-20) li herêma Qeza Moksê ya girêdayî Wanê, ji aliyê Muhtila Begê Moksî ve 4459 Ermen ji qirkirinê hatine xelaskirin".

"Ji eşîrên Kurdan zêdetir, Kurdên ku wê demê ji wan re re'aya dihat gotin ku bi tena serê xwe bûn û ji aliyê Dewleta Osmanî ve hatibûn çekdarkirin; zêdetir ev celep di komkujiyê de hatine bikaranîn. Jiber ku Rêveberiya Osmaniyan baweriya xwe bi eşîrên Kurdan nedianî; wan di vê qirkirinê de Kurdên ku wek şexis fanatîk bûn, bêkar bûn, tolaz û eware û hwd bûn û jibo karên kirêt bikêrhatî bûn; wan kirin cendirmeyên

muaqet û bi her awayî selahiyetên hemû xirabiyan dan wan û wan amade kirin û destên wan xistin nav xwîna Ermenan. Jiber ku Osmanî fitwa jî derxistibû ku qetilkirina Ermenan helal kiribû û mal û milkên wan jî helal kiribû jibo kujeran".

Ebdurezaq Bedir-Xan di pirtûka xwe ya bi navnîşana –Autobiyografiya Ebdurrizaq Bedirxan- wergera: Celîlê Celîl -weşanên kovara Metîn11-1999 Duhok-Rû56- de dibêje:

"Ser riya xwe em rastî mêr, jin û zaroyên Ermeniya dihatin, yên ber kuştara gundê Axorîkê direviyan, ku xwe xilas bikin. Min piştovaniyê li vana kir û xemxuriya wana kişand: min li ser ga da rûniştandinê û bin parastina siyarên xwe şande kilîsa Bêbêcîkê. Bi tirsfirandinê min nehîşt Kurdên wan dera ziyanê bidin Ermeniya û xirabiya biçûk jî ji wana re bikin. Ser vê kirina min keşîşên Bêbêcîkê nameke sipasdariyê ji min re şandin û dua li min dikirin".

Ermenan ne tenê destên xwe dirêjî pîrek, jin, mal û gundên Kurdan dikirin û dişewitandin, belê, destên xwe dirêjî mizgeft, - camî - û ziyaret -cihên pîroz- jî dikirin û talan dikirin. Li vir Ebdurezaq behsa talankirina cihê pîroz yê helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî dike û dide diyarkirin bê çewa kelpîçên dîwarên derdora gora wî  xerab dikirin û ji xwe re bixêriyên nanpêjiyê pê çêdikirin. Diyar e heta ew jî ji destê Ermenan reha nebûye.

"Di mercên wê demê de Kurd û Ermenên ku xwediyê hestên netewî bûne; ew di nav aramî û dostayetiyê de jiyana xwe domandine û xwedanê tifaqek bûne. Bi taybet jî ciyên ku otorîteya Kurdan hebûye; ev rewşa baş pêşberî raya mirovatiya cîhanê dike. Lê sed mixabin ciyên ku hukmên Kurdan tunebûye ango hestên welat-parêziyê qelsbûye; li wan deran gelek eşîr û tek û tek Kurd jî bûne haletên Dewleta Osmanî û dînê Ereban û di qirkirina Ermenan de hatine bikaranîn. Her weha mirov dikare destnîşan bike ku li hin herêman hin Ermen jî bûne haletên

dijmin. Bi awayeke dî ger em wê formîle bikin: Kurd û Ermenên ku hestên wan ên netewî qelsbûne û ji dervayê hukmên bandrolên netewî yên Kurd û Ermenan de jiyane, bûne haletên dijmin jibo qirkirina her du gelan".

"Lê divê binê wê were çixêzkirin ku di vê qirkirina ku Dewleta Osmanî anîbû serê Ermenan de Kurdan jî têra xwe para xwe sitandine û ew jî hema hema qasî Ermenan hatine kuştin. Tenê du numûne ku G. Sasunî di pirtûka xwe de destnîşan kiriye, vê rastiyê nîşanê me dide. ”Hêzek ku ji canfîdayên Ermen û Kazakên Rus pêkhatibûn, li hêla Aladaxê ket nav hewildana tolhildanê. 40 gundên Kurdan bi tevayî wêran bûn. Yên ber bi Gêliyê Zîlanê ve reviyan, xwe xilas kirin, yên çekdar tevayî qirbûn…" (G. Sasunî, binêre, pmnn, R.157)

"Ermenên ku li pêşiya Hêza leşgerî ya Osmaniya Mezin têk çûn, vekêşiyan Başûrê Kafkasyayê. Osmaniyan careke dî bûn hakimê

hemû Rojhelatê Ermenîstanê. Dema Kurd civiyan û hatin nik hev kom bûn, Wîlson ferq kir ku ji 500.000 Kurdên ku li herêma Ermenîstanê dijiyan, tenê 100.000 mane.” (Binêre, G. Sasunî, pmnn, R.158) Ev mîsal tê wê manayê ku 400.000 Kurd jî qir bûne û dibe ku hin ji wan di wexta şer de ji herêmê reviyane".

"Di 1914´an de ordiyiên Rûs  û hêzên Ermen ketin nav Pasen û Alaşgirtê. Di 1915´an de ber bi Bulanixê ve pêşve çûn û Wanê zept kirin û heta Çataxa Erzeromê hatin. Di bahara 1916´an de Erzerom, Xinis, Mûş û Bedlîs hatin zeptkirin. Herweha di Sibata 1916´an de hêzên Rûs  hatin heta kenerê Feratê, Çiyayên Torosê û sînorê Dêrsimê…” (G. Sasunî, pmnn, R.156)

"Li vir xûya dibe ku dema Artêşa Rûs  û Hêzên Ermen dikevin van bajar û bajarokên ku li jor navên wan ji aliyê G. Sasunî ve hatine dest-nîşankirin; gelek Kurd li herêmên xwe yên cîwarbûyî hatine kuştin û yên ku ji mintîqê

reviyane jî di riyan de ji aliyê Artêşa Osmanî ve hatine kuştin û hin kes jî ku berê reviyane ji mirinê xilas bûne. Yanê ji du alî ve tofan hatiye serê Kurdan jî. Lewre li gorî tespîtên Wilson ku nîşanê me dide; nifusa Kurdên wê mintîqeyê ji nîv milyonî gihaye sedhezarî. Ev misal bi tena serê xwe komkujiyek e. Li ser vê jimareyê, wek ez dê li jêr destnîşan bikim; divê jimareya xortên Kurd ku di bin navê leşkeriyê de ji aliyê Enwer, Talat û Kazim Karabekir paşayan ve li herêma Sariqamîş-Çiyayên Allahuekberê hatine qirkirin- ku jimareya wan dikare bigihîje sedhezarî- lê were zêdekirin. Yên ku ji bîrçîbûn û sermayê jî mirine, lê zêde bibe. Lewre Dr. Nurî Dêrsimî yê rehmetî, dema behsa wê demê (1914-1918) dike; Ew texmîn dike ku di navbeyna wan çar salan de milyonek-milyonek u nîv Kurd jî hatine qetilkirin an mirine".

Ebdurezaq Bedir-Xan di wê pirtûka xwe rû: 65-66an de dîsa dibêje:

"Jiber gundê Çûbûklûyê em liviyan ber bi gundê Molla-Hesenê. Pêşiya me de çiya bûn. Li wê derê 2000 malbatên Kurda hêwirîbûn, yên ku ji gundên xwe revîbûn. Gava wana besa hatina min bihîstin, sedek ji wana hatin cem min û got, ku general Trûxîn gava li wandera bûye, kaxezek daye destê wana, ku ewana bêqezya bin û tu kes hêrîşî ser wana nake. Piştî vê wana çek-sîlehê xwe danîne.

Lê belê, pey çûna general, Ermen hêriş birine ser wana û ewana mecbûr bûne birevin. 27 jin û qîzên ji malbatên bi nav, piştî ku namûsa wana xirab kirine, xwe avîtine gêlî û xwe kuştine.

Di nava vê sedekê de xizmê Êyûbxan-bêk, birayê Seyid-beg jî hebûne. Gundê Mêndanê yê wana bû. Ermeniyê vî gundî hêrîşî ser mala Êyûbxan-bêk kirine, jinê wana birine, mêr û xulam kuştine, hemû mal-milkê wana ji destê wana girtine."

"Berî ku Rûs  Wanê bigirta, hine wext berî wê, dewleta Turka dest pê kiribû pey Ermeniya keti-bû. Kurdên cî gihîştibûn Turka û tevî talanê û

kuştkara sosret bibûn. Bajarên Erdîşê û Arçakê gelek ziyan dîtin. Li Wanê Ermenî serîrakirin û di navbera wana û Turka de şer destpêbû û heta bîst roja dewam kir. Her tenê pey hatina hêzên Rûs a yê leşkerê Turk bajar terikandin û jê derketin. Îjar dora Ermeniya hat malê musulmana talan kin û bişewitînin".

"Numûneyeke qirkirina Kurdan û tofana ku hatibû serê wan de Enwer Paşa nîşanê raya giştî ya Kurd, Tirk  û cîhanê daye. Divê were destnîşankirin ku wê demê di dereceya yekemîn a leşkeriyê de zapitên herî bilind ên berpirsiyar Enwer Paşa, Talat Paşa, Kazim Karabekir û Mustafa Kemal (AtaTurk) in. Dema Enwer Paşa vegeriyaye Stenbûlê, li hemberî pirsên hevalên xwe û li hemberî meqamên dewletê, weha bersîv daye:

"Em dema ji derve temaşayê pevçûnên (şerên) Sariqamîşê bikin, em dikarin bihesibînin ku têk çûn, lê di rastiyê de em serfîraz bûne. Belam li ser riyên ku ji daristanên Sariqamîşê heta

Erzeromê dirêj dibûn de me bi dehhezaran cenazeyên xortên Kurd hiştin.” (Binêre, G. Sasunî, pmnn, R. 155)

"Van gotinên Enwer Paşa gelek girîng in û jibo naskirina Bizava Îttîhat Terakî û Kemalîzmê, divê hemû Kurd ji wan gotinan dersên giranbuha yên hînbûnê werbigrin. Jiber ku Enwer Paşa ne tenê fikrên xwe, lê ew fikrên hemû Îttîhat-Terakiyan aniye zimên ku jibo wan di dereceya yekem de Kurd dijmin in û divê ji holê werin rakirin. Loma jibo wan, têkçûna wan a di Şerê li Hemberî Rûs a n de yanê bi gotineke dî di Şerê Cîhanê yê Yekem de ne girîng e; ya girîngtir ew e ku wan çiqasî Kurd kuştine û dane kuştinê, ye. Lewre di dema şerê Komkujiya Ermenan de gotinên ku zapit û memurên Tirk dubare kirine ev bûne: **”Zo çû, Lo ma!”** yanê bi awayeke dî ”Me Ermenan kuşt, Kurd man".

Di raporta vekolîner Emory Noles û Arthur Sutherland yên Emêrîkî de hatiye: "Di herêma

Bedlîs, Wan û ta bighê Bayezîdê û derdora wê em geriyan, me xerabî û talan kirina van herêman ko bi destê Ermenan bibû bi çavên serê xwe dît. Nemaze piştî vekişandina supahê Ûris ji van herêman. Ji bilî van karên xerab, Erman bi hovîtî dest bi kuştin, destdirêj kirin, şewtandin û talan kirina mal û milkên niştecîyên herêmê kirbûn. Bi rastî di serî de me bawer nekir, heta me bi çavê serê xwe dît û em zehî û matmayî man jiber vê susreta nebûyî. Tiştê ko pirtir rasteqîneya xelkên herêmê li ba me çêkir, dema ko me li bajarê Bedlîs û Wanê taxên Ermena wek xwe me dît û yên Kurdan tev şewitî û xerabûyî bûn, wê gavê pirtir em ketin rastiya pirsgirêkê. Tiştê pirtir pendî bûn, ew dêr û nivîsandinên li ser dîwarên xaniyan. Gundên ko Ermen lê niştecî bû wek xwe mabûn. Lê, gund û mizgeftên Kurdan tev şewitî û xerabkirî bûn".

Li cihekî din di raporê de hatiye: "Digel ko ne warê vekolîna me bû, lê di gera xwe de em rastî gelek rastiyan hatin û pir bandore wê li me ma,

jê; Di her cihekî ji axa Bedlîs heta Trabzonê me xerabiyên ko Ermen bi serê niştecîyên herêmê kirye, eynî tişt Turkan li herêmên dî bi serê Ermen kirye" dît.

Ebdurezaq Bedir-Xan di pirtûka xwe de ya bi navê –Autobiyografiya Ebdurrizaq Bedirxan- wergera: Celîlê Celîl -weşanên kovara Metîn11-1999 Duhok-Rû57-58 de hatiye:

"Şayîr Ehmedê Xanî li nava Kurda buhurtî tê hesabkirinê û hilbestên wî bi fîlosofyê û bedewetiyê dagirtîne. Wan helbestana çawa stranê ziyaretî distirên. Ew kumeyt hilşandine û kerpîçên wî, ku pê hatibû avakirin, birine ji bona çêkirina bixêriyên nanpetinê. Him gora wî, him jî gorên merivên dorûberê û mizgevt bêrûmetkirine û hilşandine".

Evdilrehman Bedir-Xan di çend hijmarên rojnama Kurdistan de, li ser pirsa Ermeniyan radiweste. Divê bi çi awayî dibe dixwaze ku fermana Sultan Evdilhemîd di derheqê kuştina Ermeniyan li Kurdistanê bide sekinandin. Di

nivîseke xwe de weha bang li Kurdan dike: ”Şerê Ermeniyan û Kurdan de ez zanim Kurda Ermeniyên bê guneh kuştin, Xwedê ji vî halî ne razî ye Kurdan ew guneh ji cahiliya xwe kir. Wan nedizanî kuştina Ermeniyan wek kuştina mislimanan e. Parek wî gunehî ji li ser alimên Kurdan e. Divê alim tişta qenc û heqene nîşa cahila bikin, da ew jî mirovên bê guneh nekujin”.

Ebdurezaq Bedir-Xan derdekî dî yê Kurdan ji destê Ermenan dide xuyakirin ew jî bêbextiya wan Ermenên ko bi karê wergeriyê ji Ûris re dikirin, bê çawa bêbextî û derew li Kurdên reben dikirn. Diyar e E. Bedir-Xan hay li vê yekê dibe, desthilatdarên Ûris pê haydar dike, lê mixabin diyar e ne li gorî bayê wan e Ûris guh nadin gotina wî. Di vî warî de E. Bedir-Xan dibêje:

"Çend gundên Kurda li ser buxdana Ermeniya, bi gullê topa hilşya bûn. Di vê em rastiyê bêjin, wekî Kurdên Celalî, yên nîvbeyanî û şerkarin û di şikevta da xwe vedişartin, ji çiyayê Araratê gulle berdidan ser leşkerên Rûs a . Û her cara,

gava li ber tercûmanên Ermeniya, yên ku li bal zapitên Rûs a kar dikirin, rê vedibû, gunehbariya van kirina davêtin ser stûyê Kurdên reben, gunfiyên ku qet gunehê wana tê tunebû û bi giştî di bin bandûra leşkerê Rûs a de bûn.

Piraniya zapitên Rûs a Ermenî ji Kurda zêdetir dinirxandin. Jiber şirovekirina vir û derew, ewana (Rûs) pir caran, bê hemdî xwe, himberî Kurda neheq derdiketin. Jiber wê jî min time ji gênêrala ra digot, wekî bona peywandiyê tevî Kurda, ewana tercumanên xwe, divêt ji nava Kurdên sunnî, ji Yêrevanê û Qersê bibjêrin. Raste ewana pêşniyara min qebûl dikirin, lê tucara di karê xwe de bi cî netanîn".

Şoreş Zîrek dibêje:

"Di encama wan daxûyaniyên eşkere ye ku serok û rewşenbîrin Kurdan di weşanin xwe da li ser komkujiya Ermeniyan da beyankirin e, mirov nikare gelê Kurd di qetlîama Ermeniyan tawanbar bike. Di tevliheviya şerên di sedsala 19`an û 20`an taybetî berjewendiyên Împarato-

riyatin Rojava û Împaratoriya Osmanî da, neteweyin bindest Kurd û Ermenî bûn qurban. Jiber vê yekê tû kes û kesayetiyek bi Kurdiyatî xwe hesiyayî qetliama Ermeniyan rast ne dîtin, tê da cîh nesitendiye, nebûye şirîkê xwinxwaran.

Ew Kurdên di bin navê ”Ummeta Mihemed” da û di nav refên Teşkîlatî Mahsûse, medresên olî û artêşa Împaratoriya Osmanî da şerên Ermeniyan kirine. Herweha wan şerê Kurdên Êzdî û Kurdên Elewî jî kirine. Wek tê zanîn hinek komêkên Ermenî bi serê xwe û bi alîkariya Ûrisetiya Qeyserî êrişî gund û bajarên Kurdan dikin, gelek kujtin dikin.

Hinek ji tevgera Ermeniyan pey Ermenîstanek Mezin bûn. Partiya Ermeniya Hiçaksiyun a ku têkoşîna Ermenîstanek Sosyalist dikirin. Tevî vêya ji îrada siyasî ya Kurd li rêgehên hevkariyê bi tevgera neteweyê Ermenî digeriyan. **Abdurrezak Bedir-Xan** li Eriwanê bi rêza Qeyserê Ûris li gel tevgerê Ermenî têkilî pêktîn

e. Ji bo tevgerek çekdarî hewil dide û demek li Ûrmiyê, li herema Wanê, li gel çekdarên Kurd û Ermeniyan digere. Lê, mixabin ku pişt re Ûris jiber sedemên têkiliyên xwe yên nehinî li gel dewleta Osmanî û Farisî piştgiriya Abdurrezak Bedir-Xan nakin. Serokê eşîra Heyderan **Kor Hûsên Paşa** bi serok eşîrên Kurdan ên din re hevdîtin dikir jibo haziriya rêxistinkirina serhildanekê li dijî Tirkan ji bo avakirina otonomiya Kurdistan di bin kontrola Rûsiya Qeyserî de bikin. Di **serhildana Girîdaxê** de, rêxistin û kesayetin Ermenî hevkariya şervanên Kurd dikin. Wek tê zanîn gelek şêx, mirovhez û serokeşîrên Kurdan Ermenî ji qetlî'amê xilas dikin, wan di nav xwe de vedişêrin û alîkariya wan dikin ku bigihîjin welat û heremên bêxeter.

Di encamê de, digel her tiştê ko bûyî û bûye pirsgirêk ji bûyer û komkujiya Ermenan dûrtir e ji ravekirina ko Kurd nezan bûn yan jiber hestê ayîna kor bû. Ez bawer dikim, pirsgirêk gelek hêman û sedemên xwe hebûn, û gelek dest di

amadekirina wê de hebûn. Desthilatdarên Osmanî nedixwestin pirsgirêka Ermenî çareser bikin; û di eynî demê de, tirsa wan hebû ko Ermîniya ji destê wan here, mîna ko Belqan ji destê wan reha bû. Ji hêleke din ve, Elman nêzîkbûn û girêdana Ermen ji herdû dijminên xwe Rûsiya û Brîtaniya re xweş dizanibû, û ew dûrî xwe didîtin. Lewra, haydar bû ko Rûsiya û Brîtaniya, digel Fransayê dixwazin di riya pirsgirêka Ermenî re destdirêjî nav kar û barê dewleta Osmanî bikin. Elman jî bi hemû hêz û hunera xwe, destê xwe dirêjî pirsgirêka Ermenî dikir û dixwest ev pirsgirêk di çarçewa dewleta Osmanî de bimîne. Ev koka komkujiyê ye, ya ko hinek Kurdên nezan jê re bûn destik. Gunehkarê mezin di ber vê komkujiyê de dewleta Osmanî, Elmaniya, Brîtaniya, Rûsiya û Taşnaqên Ermen in.

## Şerê Cîhanê yê Yekemîn

## û Mihacirî/ Mişextî:

Di salên 1915-1917an de, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, li Bakurê Kurdistanê nemaze herêmên li ser sînorê Ûris, eniya "Qersê – Gurcistanê", giraniya şer ketibû wê hêlê. Supahên Ûris û bi rêberiya hêzên Ermen – Taşnaq - di 2yê Çiriya Paşî 1914an de, derbasî Kurdistanê dibin. Supahên Osmaniyan xwe li ber yên Rûsiya û Ermeniyan negirtin. Her şer germ dibû, hêzên Osmanî berûpaş ve vedikişiyan. Supahên Ûris bi rêberiya Ermenan Erzerûm, Wan û Mûş bindest kirin.

Di sala 1915an de, şer di navbera supahên Osmanî û yên Ûris de li ser xaka Kurdistanê pir germ dibû. Supahên Rûsiya her wir de diçû biser diketin. Ermenan baş alîkariya Ûris li dijî Osmaniyan kirin. Supahên Ûris her herêma ko radestî xwe dikirin, şûrê Ermenan li hemberî musulmanan tûjtir dibû. Ermen bi çavsorî û bê

dilovanî dest bi kuştina Kurdan kirin. Mal û milkên wan ji xwe re dibirin. Jin û zar û zêçên wan dikuştin, xaniyên wan dişewitandin û pez û dewarên wan ji xwe re dibirin. Bi helwesta bêdengiya Ûris, Ermenên Taşnaq yên faşist, hişk û ter tev didan ber hev.

Ebdurezaq Bedir-Xan di pirtûka xwe ya bi navnîşan –Autobiyografiya Ebdurrizaq Bedirxan- wergera: Celîlê Celîl -weşanên kovara Metîn11-1999 Duhok-Rû-58 de dibêje:

"Piraniya zapitên Rûs a Ermenî ji Kurda zêdetir dinirxandin. Jiber şirovekirina vir û derew, ewana (Rûs ) pir caran, bê hemdî xwe, himberî Kurda neheq derdiketin. Jiber wê jî min timî ji gênêrala ra digot, wekî bona peywandiyê tevî Kurda, ewana tercumanên xwe, divêt ji nava Kurdên sunnî, ji Yêrevanê û Qersê bibijêrin. Raste ewana pêşniyara min qebûl dikirin, lê tucara di karê xwe de bi cî netanîn".

Dem dema şer bû. Rewşa welat tev geremolî bû. Bi şikestina leşkerê Osmanî re, Ermenan dest

bi van karên kirêt kirin, Kurdên van her şeş parêzgehan: "Erzerûm,Wan, Mûş, Betlîs, Sêrt û Qers" û derdora wan, jiber şer û hatina supahê Ûris û êrîşên Ermenan, ji bêgavî ji herêmên xwe barkirin û mişext bûn.

Di vî warî de, Dîrokzan Hesen Hişyar Serdî dibêje:

"Welatê jê mihacir bûn: "Artevîn, Erzerûm, Wan, Mûş, Bedlîs" ev pênc wîlayetên mezin tev de welat berdan".

Evî şerê dijwar jiyana Kurdên ku ji gund û bajarên xwe derketin, tev guhert. Mirovên xwedî mal û milk bûn, xwedî pez û dewar bûn, di şev û rojekê de bûne mirovine penaber, penaberên tazî, birçî, parsek û bê xwedî.

Di vî warî de,  Dîrokzan Hesen Hişyar Serdî dibêje:

"Ewçend mihacir dihatin, lê cî tunebûn lê bihêwirin, herkesî deriyên hewşên xwe li ber

wan digirt in. Tevî ko zivistan bû û berf jî li erdê bû, jin û zarokan xwe didan ber dîwaran û digiriyan jiber serma û nazan dimirin. Lewre, hingî pir bûn, di hewandina wan de imkan tune bû. Ji milê dî, ji birçînan bi zor û xweşî ji xelkê xwarin distendin an didizîn an direvandin. Hingê ulçeka genim bi du zêra bû. lê dîsa peyda ne dibû. Belengazan ber xalî xişrên xwe yên zîv û zêr bi çaryeka biha didan. Lê piştî ew jî neman, jin û mêr çi kesên malmezin û xanedan teva pars dikir. Lê sed mixabin, li tevaya welat nan giranîkî mezin dest dabûn ku êdî pars jî bi dest nediketin!.. Ji alîkî birçî, ji alîkî serma. Ji milê dî, sipî, nexweşiyên tîfo û ta'ûn nav wan û leşkerên eniya şer de, paşê li tevaya welat jî vegirt."

Ebdurezaq Bedir-Xan di pirtûka xwe ya bi navê –Autobiyografiya Ebdurrizaq Bedirxan- wergera: Celîlê Celîl -weşanên kovara Metîn11-1999 Duhok-Rû69- de dibêje:

"Ji Şamînîsê heta Cizîrê 12000 konê koçerên ji Botanê û mihacirên ji wîlayeta Wanê vegirtî bûn."

Piştî ko Kurd ji gund û bajarên xwe, ji neçarî, derketin û mişext bûn, pir dijwarî û malwêranî bi serê wan hat. Mal û milkên xwe, pez û dewarên xwe û gund û erdên xwe tev hiştin û ketin riya mirinê. Hinan ji wan berê xwe dane Kurdistana Başûr, hinên din berê xwe dan Binxetê, û hinên din jî berê xwe dane Anadolê, nava Turkiyê.

Dîrokzan Hesen Hişyar Serdî[1] li ser qûnaxa mihaciriyê xweş nivîsiye û dibêje:

"Piştî salekê ji şer leşkerên Osmanî berûpaşve dikişiyan, roj bi roj, eniya şer bi şûn de vedigeriyan, heya ku enî kete Erzerûm, Wan û Mûşê. Kurdên van hawîran tev de welat berdan û mihacir dibûn ber bi Kurdistana jêr ve. Lewre bi

[1] -Hesen Hişyar Serdî, Destnivîsa Jiyîn û Dîtinên min, beşê: li Kurdistanê mihacirî û dijwarî,birê18, Rû:43-47-an.1960-z.

şikestina leşkerên Osmanî ew valayî tev de mihacir dibûn û leşkerên Rûs şûna wan dadigirtin. Sebebê mihacirî yê yekemîn ev bû: Dema leşkerên Rûs diketin welat Ermen jî bi wan re bûn, wan Ermenan bê dilovanî Kurd dikuştin, çima ku Turkan ew kuştibûn heyfa kerê ji kurtan digirtin. Lê, ne dihat bîra wan Ermenên Taşnaq ku; Kurd ne qatilên mene, jin û zarokên me vedişêrin û ji kuştinê diparêz in. li hember vê dilovaniya Kurdan, wan bi awakî sosret zikê pîrekan diqelaştin, zarok jê derdixistin, laşê wan bi saxî diqelaştin, dikirin berîk, destê wan dixistinê û digotin: berîka te qence Kurdo! "Bingeha wan "Taşnaq seganan" li Sûriyê hêj li ser wê dilreşiyê dimeşin. Li "Heleb herac Papasyan" bi navê rojhelat roznamekî Ermenî derdixe, tevî ku têde-ên roznamê tev de neyartiya "hukûmeta Yêrîvan" ê û Îttîhad Sovyêt e, lê salê carek dike cejin; roja ku li "Çiyayê Alegoz"ê Kurd kuştine di heyamê hukumê wanê Taşnaq de. Ji dêla ku ji wan kirde-ên xwe yên dijûn

şermezar be heşê miletê xwe bi neyartiya Kurd dideqîne. Hin mîrza-ên Kurd dostê wî faşistî ne. Sebebê mihaciriyê yê yekemîn ev bû".

Ebdurezaq Bedir-Xan di wê pirtûka xwe rû: 65-an de ďîsa dibêje:

"Jiber gundê Çûbûklûyê em liviyan ber bi gundê Molla-Hesenê. Pêşiya me de çiya bûn. Li wê derê 2000 malbatên Kurda hêwirîbûn, yên ku ji gundên xwe revîbûn".

Mihacirî û derdê biyaniyê ne bes bû, di ser de, bi helwesta bêdengiya Ûris, Kurd bi destê Ermenên Taşnaq dihatin kuştin. Ji hêleke din ve, gelek mirov ji wan, ji ber birçîbûn û nexweşiyê dimirin, û gelekên din hevûdu winda dikirin, û gelekan jî, bi taybetî yên berê xwe dane Anadolê, bi rê de dimirin. Ji xwe ya Osmaniyan ji hêla Kurdan ve ji wan re lê hatibû. Helwesta wan helperist bû. Ji hêlekê de, di şer de, alîkarî ji Kurdan dixwestin. Ji hêla din de, niştecihên Kurd

ji agirê şerê Ûris û Ermenan nediparastin. Tu dibêjî ma ne hemwelatiyên vî welatî ne!!.

Dîsa Hesen Hişyar dibêje:

"Bi ser van zîvarî, belengazî û perîşaniya wan de jî wek keriyên pez didan ber xwe dajotin Anadol û dora Adanê, ez bawerim ji 20% negihan wan erdan tev de bi rê de mirin. Hin ji Turkan zarokên bê xwedî ji bona xizmetê ji xwe re dibirin. Mîna herdû dengbêjên navdar "Perîxan Altuncax û xuha wê Narîman" ji Kela Xinûsê bajarê Şêx Se'îd , di mihaciriyê de weke min got li Anadolê man û bûn hunermend".

Di sala 1917an de, supahê Ûris nêzîkahî li Sêrtê dike û digihê Kevrê Qul. Li wir pir dirêj nake berûpaş ve vedikşe û ji Kurdistanê der dikeve. Li hemberî ko Ûris di şer de û bi alîkariya Ermenê Taşnaq serefraz in, xwe ji şer vekişandin. Sedemê vekişandina Ûris ji Kurdistanê ev bû: Şerê hundirî geş bûbû, û di

sala 1917an de, şoreşa Belşevîk bi serkêşiya Fladîmêr Lenîn biser ketibû.

Ermen, Ûris û Turk di ber kuştin û penaberiya Kurdan de gunehkar in. Talankirin û şewitandina gund û bajarên Kurdan erk û stubarê Ermen, Ûris û Turkan de ye. Ûris û Ermenan welatê Kurdan blindest kirin, û ziyaneke pir xerab gihandin Kurd û Kurdistanê. Di sala 1917an de, Ûris vekişiyan û desthilatiya herêmê di destê Ermenan de ma. Lê Ermenan nikaribûn wê valahiyê dagirin. Di wê demê de, Ermen bi hovîtî û destekî hesinî li Kurdan xistin. Eşqiye û çeteyên Ermenan careke din welatê Kurdan talan kirin. Supahê Osmanî berî da Erzencan, Wan û Erzeromê û bi destekî hesinî li çeteyên Ermenan xistin û ew ji hev tarûmar kirin.

Ji hêleke din ve, eger em li ser tevaya herêmên Kurdistanê bipeyivin wê mijara me pir dirêj bibe, nemaze herêmên din ji Kurdistanê, û li ser kêmbûn û tunebûna niştecîyan bipeyivin. Bi

kurtayî, kêm-zêde, windabûn û kêmbûna nişteciyan: ji herêma Wanê pirtirî 62% , ji herêma Bedlîsê 42%, ji herêma Erzeromê 31%, ji herêma Qersê 60%, Mûş 55% û ji Sêrt 30% winda hene.

Hesen Hişyar dibêje:

"Di cengê de, ji xisara eniya şer pê ve wê mihaciriyê di kêmbûna Kurd de birînên mezin vekirî hêştine ku piştî 45 salan yanî di vê sala 1960î de –Dema nivîsandina vê nivîsê- ez ji setastîkên wan pênc wîlayetên mihacir bûyî digirim. Kesafeta ji 20% derbas dibe. Ev e birînên cenga cîhanê li ser singe diya me Kurdistanê heya niho axiftî vekirîne! Ku zêde yê 2000 000  du milyon di infusê de jimar kêm kiriye ji sewre-ên salên dawîn pêve, tevî şerê nexweşiyê her û her li Kurdistanê enî vegirtiye!".

## Serhildana Şêx Se'îdê Pîran 1925:

Serhildana Şêx Se'îdê Pîran yek ji serhildanên mezin ên Kurdan di sedsala 20'emîn de ye.

Piştî peymana Lozanê, Mustefa Kemal hebûna Kurd û Kurdistanê nadar kir. Di sala 1922yan de, di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî, perlementerê Bedlîsê Yusuf Ziya, Kemal Fewzî û Şêx Se'îd de, Rêxistina Azadî hat damezrandin. Armanca Rêxistina Azadî serxwebûna Kurdistanê bû. Mustefa Kemal, bi dekûdolaban serokê Rêxistinê Xalid Begê Cibrî û hevalên wî Yusif Ziya û Hecî Musa Beg girtin û berê wan da Bedlîsê û bidarve kirin. Şêx Se'îd dibe serokê Rêxistina Azadî. Şêx Se'îd digel hevalên xwe, ji Hênê çû Pîranê. Li gundê Pîrana beldeya Egîl ya navçeya Genc Erxaniyê, di 13ê sibata sala 1925'an de, dengê çekan, xebera yek ji serhildanên girîng ên dîroka Kurdî dida. Ev Serhildan ku weke Serhildana Şêx Sa'îd derbasî dîrokê bûye, wiha destpê kir.

Di heştê Sibata 1925an de, li Pîranê çend eskerên Tirk ji aliyê şervanên Şêx Se'îd ve hatin kuştin. Tirkan êrîşî hêzên Şêx Se'îd kirin. Bi vî sedemî serhildana Şêx Se'îd berî wextê xwe û ji nişka ve dest pê kir.

Piştî vê çurûska yekem, Serhildana li herêmeke berfireh belav bû. Pîran, Hênê û Licê girtin. Di 14ê Sibatê de, avêtin ser beldeya Darahênê ya navenda bajarê Gencê û walî û hin rayedarên din girtin. Şêx Sa'îd di demeke nêz de Genc, Maden, Sêwereg û Erxaniyê bi destxist û ber bi Amedê ve meşiya. Komeke din jî Wartoyê bi destxist û berê xwe da Mûşê. Hukûmetê di 21ê Sibatê de li bajarên Kurdan, Rêveberiya leşkerî îlan kir. Lê belê, yekîneyên artêşê di 23iyê sibatê de, li hemberî serhildêran paş ve vekişiyan Amedê. Dîtira rojê jî, Elezîz kete destê berxwedêrên Kurd. Enqere tevlîhev bûbû. Mustafa Kemal di destpêka meha Adarê de, (îstîfaya) dest-ji-kar-kişandina Serokwezîr Fethî Okyar xwest. Piştî ku hukûmet hate guhertin, di

3iyê Adarê de, erka serokwezîriyê spartin Îsmet Paşa (Înonû). Di 4ê Adarê de, hukûmetê dengê ewlebûnê ji parlemento wergirt, û di heman rojê de Qanûna "Teqrîrî Sukûn" derxist. Ev qanûna ku sala destpêkê di pratîkê de ma, destûra rewşa awarte dida hukûmetê.

Hêzên Şêx Sa'îd, di 7ê Adarê de, Amed dorpêçkirin. Şerekî pir mezin di navbera hêzên Kurd û Tirkan de çêbû. Lê belê, bêyî ku bajêr bidest xwe bixin, neçar man ku paş ve vekişin. Hinek eşîrên Kurd girtin aliyê xwe û bi alîkariya Îngilîzan, di riya trênê ya xeta Mêrdînê re, leşker kişandin ser Amedê. Hêzên Kurd li Amedê têkçûn. Piştî ku li herêma serhildanê tijî leşker kirin, yekîneyên artêşa Tirk di 26ê Adarê de, ji jor û ji erdê ve, êrîş dane destpêkirin. Êdî serweriya şer diket destê hêzên hukûmetê. Şêx Se'îd ji bêgavî û neçariyê hêzên xwe bi aliyê Bakurê Rojhelat ve vedikşîne. Caşekî ji wî re bûsekê danî. Şêx Se'îd bi hêzên xwe yên mayî ve, di 27ê Nîsana 1925an de, li nêzîkî bajarê

Mûşê kete kemînê. Ew, ji aliyê leşkerên Tirk ve hate girtin. Şêx Se'îd bi hevalên wî ve anîn Amedê. Dewleta Tirk di roja 30ê Hizêranê 1925an de, li Amedê Şêx Se'îd bi 48 hevalên wî ve bidarve kirin.

## Serhildana Agiriyê

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê Kal di sala 1925an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kir – ya ko bi siyaseta Tirkkirinê (tetrîk) tête naskirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin. Çek ji destê hoz û 'eşîrên Kurdan derxistin. Berê agirê sitemkariyê giha hemû warên jiyanê (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî).

Bi sedhezaran Kurd dûrî welêt xistin. Kurdistan kirin dojeh. Gelek ji wan siyasetmedar û welatparêzên Kurd penaberî Sûriyê, Îraq, Îran û Ewropayê bûn. Lê, digel van karan tevan jî, dewleta Tirkan nikarîbû viyan û hêviyên Kurdan ji hest û hizrê wan yên neteweyî bibirin û rehên agirê serhildan û berxwedanên wan vemrînin. Ew agirê ko li Çiyayên Cabikcûr, Farqîn, Sason û Agiriyê vêxistî mabû, di şerê xwe de berdewam bû.

Di sala 1926an de, Biro Telî Heskî li çiyayê Agiriyê li dijî dewleta Tirk dest bi serhildanê kir. Hinek ji serok û pêşewayên Kurdan yên ku derketibûn derveyî welêt jî, di roja 5.10.1925an de, li derveyî welêt rêxistina Xoybûn damezirandin. Xoybûnê têkilî bi Biro Telî Heskî re danî. Xoybûnê, Ihsan Nûrî Paşa kir berpirsiyarê leşkerî û bi hêzeke mezin ve, ji bo alîkariya Biro Heskî Telî şandin çiyayê Agiriyê. Hukûmeta Agiriyê di bin serokatiya Biro Heskî Telî de hate damezirandin. Di programa hukûmeta Agiriyê de, bi tenê serxwebûna Kurdistana Bakur hebû. Li hember dewletên din yên dagîrker, polîtîkeke nerm û dostanî dabû pêş xwe.

Hukûmeta Agiriyê di nav şoreşê de kovarên Agirî û Gaziya Welat deranîn.

Di demeke gelekî kurt de, hêzên Kurd yên çekdar ji 10 hezaran bêtir bûn. Dewleta Tirk bi balafir, top û tankan, û bi 100 hezar leşkerî ve êrîş bire ser Agiriyê. Lê, di her êrîşê de, bê

hejmar leşkerên Tirk  dihatin kuştin. Her ku diçû rewşa ordiya Tirk  xerab dibû. Hukûmeta Îsmet Înonu neçar ma, û di Êlona 1928an de, hey'etek şand ba hukûmeta Agiriyê jibo danûstandinê. Di nav hey'eta Kurd û Tirk  de, çend caran guftûgo çêbûn. Di encama van guftûgoyan de hukûmeta Tirk, ew Kurdên ku sirgûnî Anatolê kiribûn, vegerandin Kurdistanê. Dewleta Tirk, dîsa bi planên xwe yên xapandinê biser neket. Dest bi qirkirina gelê sivîl kir. Li Geliyê Zîlan qasî 15.000 Kurdên sivîl bi carekê de kuştin.

Dewleta Tirk, êdî nikarîbû bi hêzên leşkerî yên Agiriyê re biser bikeve. Careke din wê dest bi planên xwe yên kirêt yên kevnare kir. Bi dewleta Îranê re dest bi guftûgoyan kir. Di encama van guftûgoyan de, Tirk  û farisan li ser guhastina tixûb lihev kirin. Tirkiyê parçek xaka ji Rojhelatê bajarê Bazîdê da Îranê û di şûna wê de jî Agirî ya Biçûk ji Îranê girt. Û herweha herdu çiyayên Agiriyê jî ketin bin destê Tirkiyê. Tirkiyê, ji çar aliyan ve derdor li hukûmeta

Agiriyê girt. Riyên alîkarî û piştgiriyê jê hatin standin. Têkiliyên hukûmeta Agiriyê ji her alî ve qutkirin.

Hukûmeta Agiriyê, di bin van hoyên gelekî dijwar de, bi mêrxasî heta sala 1931ê li ber xwe da. Di sala 1931ê de xwarin û cebilxanên hêzên Kurd kêm bûn. Hêzên Kurd bi serokên xwe ve, xwe radest nekirin. Di dawiyê de, çeperên şer şikandin û derbasî Îranê bûn. Hukûmeta Kurd a Agiriyê têkçû.[2]

[2] - Ji pertûka Dîroka kurd û Kurdistanê, Amed Tîgrîs û Aso Germiyanî, Stockholm, 1999, Koral.

## Komela Xoybûnê

Dema ko welatperwerên Kurd yên penaber bi çavên serên xwe dîtin bê çi bi serê gel û welatê wan hat, û dijmin di hovîtiya şerê xwe de her berdewam e, biryara girêdana kongirekî giştî ji hemû welatparêz, xwedî civat û rêxistin, siyasetmedar û rewşenbîr, beg û serokên hoz û 'eşîran dan.

Giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên Kurdan yên belavbûyî li ser pirogrameke yekbûyî hebû.

Damezirandina navendeke giştî ko cihê standina biryaran û piştgiriya şoreşa Agirî bike, çi di warê aborî û leşkerî de, û çi di warê siyasî, diblomasî û piropaganda de be.

"Xoybûn"ê wek rêxistin ji bo Kurdistaneke serbixwe tekoşîn dikir, ev daxwazeke polîtîk bû. Lê belê, "Xoybûn"ê di belgeyan de, û li ser kaxezê belgekirî, wek rêxistineke serxwebûnê xwe nedida nasîn. Wê li ser pirtûkên xwe, di weşanên xwe de, di destûra xwe de hertim

"Xoybûn" weke rixistina netewî ya Kurd bikar tanîn, ev yeka jî gelek balkêş bû.

Ewan welatparêzên kelecan û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn sala 1927an de, li Beyrûdê, Bihemdûnê, lidar xistin. Di wî kongirî de çend biryarên dîrokî hatin sitandin. Hêja ye em wan biryaran bînin bîra xwe:

**Biryarên kongrê Xoybûnê ev bûn:**

1. Helkirina hemû civatên Kurdî yên hene, û pêkanîna civateke Kurdî ji hemû endamên kevin kom bibin û rê li ber endamên nû vekirî be.

2. Şoreşan li dijî Tirkan dirêj bikin, ta yek leşkerê Tirk li ser axa Kurdan nemîne.

3. Berî pêxistina agirê şoreşa giştî, li ser van xalên jêrîn biçin:

a) Ji bo hemû hêzên niştimanî yên Kurdî, pêşewayê giştî destnîşan bikin.

b) Rêxistina hemû hêzên şoreşgêrî li rêbazên leşkerî û cengawerî de baştirîn çekên şervanî di destên şoreşgêran de bin.

c) Ji şoreşê re melbendeke giştî bête nîşankirin, û ji bo hêzên leşkerî serkirdayetiyeke bilind di çiyayekî ji çiyayên Kurdistanê yên bilind de bê danîn.

4. Ligel dewleta Îranê û bi gelê faris re peywendiyên biratî û xweş girêdin.

5. Bi herdu dewletan (Sûriyê-Îraq) re peywendiyên xwe girêdin, û ew mafên li gora sekihên çavdêrî ko peyman û rêkeftinên navdewletî bi Kurdan dabûn bes in, û doza tu mafên siyasî yên din ji herdû dewletan nekin.

## Di dîroka Xoybûnê de şweyên xebat û çalakiyan

"Xoybûn"ê, dest bi kar û xebata xwe ya neteweyî kir û bi serokên ‘eşîran, serdarên siyasî û bi malmezinên Kurdan re têkilî girêdan, û bi

hev re danûstandin kirin ko di dema pêwîst de amade bin.

"Xoybûn" roj bi roj xebata xwe berfireh kir û bi Kurdên derveyî welêt re têkilî girêdan. Nûner û endamên "Xoybûn"ê li her çar parçên Kurdistanê û li derveyî welêt (Ewropa-Emerîka) çêbûn. Peywendî di navbera serkirdayetiya "Xoybûn"ê û parçên Kurdistanê yên din de jî çêbûn.

**Xebat û çalakiyên "Xoybûn"ê di warê leşkerî de:**

Bi rastî, em nikarin xebata "Xoybûn"ê û şoreşa Araratê ji hev veqetînin, jiber ko li dora çar salan (1927-1930), bi hev ve hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko pareke mezin ji berdewamkirin û geşkirina agirê şoreşa Agirî bi keda rêxistina "Xoybûn"ê bû.

1. **Şoreşa Agirî:**

Ihsan Nûrî paşa serkêşiya şoreşa Agirî dike, û ala Kurdî û durişma civata "Xoybûn"ê jê re tê rêkirin. Serokê şoreşa Araratê ev durişma han kiribû nîşana efserên xwe, û çiyayê Agirî kiribû nîşana leşkeran.

Rêveberiya dezgehên bajêr bi serokatiya Birahîm paşayê Hisikî damezirandin.

Devereke fireh vegirtin: “Ararata mezin û ya piçûk, cihên Torbax û Kelhê, Tendirok, Aldax, Mîlêc, Kêrik, Êrhebeş, Zîlan, Eyaxa, Barkêrê û Diyadînê.

2. **Pirojeya şoreşekê ji başûr (binxetê):**

"Xoybûn" şeva 3/4ê tebaxê, sala 1930-î roja êrîşkirina ji başûr (binxetê) ber bi bakur (serxetê) ve biryar standin.

Serkirdayetiya "Xoybûn"ê enya şer ji Cerabulsê ko dikeve ser qeraxa ava Feratê, ta Endîwerê li

ser qeraxa ava mezin (Dicle), û li ser şeş deveran ji Rojava ta Rojhelat li ser endamên Xoybûnê belav kirin. Ev belavkirin jî li vê gorê bû:

1. Devera Kobanê: Bozan Şahîn Beg û birayê xwe Mistefa Beg serokên hoza beraziyan, û Osman Sebrî berê wan li Urfayê û Mereşê bû, û wê Osman Sebrî ber bi hoza merdîsan ve here.

2. Serê Kaniyê: Mehmûd Begê Birahîm Paşa yê Milî ber bi Wêranşehir here.

3. Devera Dirbêsiyê: Ekrem Begê Cemîl Paşa û Qedrî ber bi Mêrdînê herin.

4. Devera Tirbesipiyê: Haco Axa serokê hoza Hevêrkan ber bi cihê Hevêrkan here.

5. Devera Dêrikê: Celadet Bedir-Xan Beg serkêşiya vê hêzê dikir û pê re Mihemed Begê Cemîl paşa û hin ji begên devera Botan mîna Resûl Axa serokê hoza zîlan.

6. Devera Tilşe’îrê: Cemîlê Seyda û herdu kurapên Şêx Se'îd (Selahedîn û birayê xwe),

digel pênc hevalên din , di herêma Nisêbînê re herin.

## Xebata "Xoybûn"ê di warên siyasî, civakî û rewşenbîrî de:

"Xoybûn"ê gelek şêweyên tekoşînê yên ji hev cuda û curbicur bikar tanîn. Weke nimûne, di xala 17an ya destûra wê de, tiştekî gelek balkêş cih girtiye, ew jî ev e: ”Propaganda divê him devkî him jî nivîskî bête kirin. Di warê propaganda devkî de, divê miftî û derwêş stran, qesîde û çîrokên Kurdî di nav gel de belav bikin; û bi vî awayî zordariya Tirkiyê nîşan bidin”. Nivîskar Rohat Alakon di vî warî de dibêje: ”Ev cara pêşîn e ko rêxistineke Kurd folklor û edebiyatê di warê hişyarbûna neteweyî de wek çekekê bi kar tîne û vê yekê di destûra xwe de bi cih dike”. Ligel tekoşîna çekdarî, "Xoybûn"ê bi taybetî baweriya xwe gelek bi kaxez û pênûsê tanî. "Xoybûn"ê wek rêxistin bi zimanên Inglizî, Fransî, Erebî û Tirkî çend pirtûkên înformatîk û hînker di derbarê rewşa Kurdan de weşandin.

Piştî şoreşê, rewşa xwe birêxistin û biserûber kir, rojnameyek bi navê Agirî derxist û di jimarekê de marşa xwe ya leşkerî belav kir (Agirî Agirî-Ji 9 malikan pêk tê).

Hin daxwiyanî ji bo piştgiriya şoreşê û geşkirina hestê neteweyî di nava gel de, çi li hindurê welêt û çi li derveyî welêt, dihatin belavkirin.

Radyoya Kurdî li Bêrûdê hate vekirin û radyogêrê wê Dr. Kamîran Bedir-Xan bû. Di rojê de, çarîk katjimêr nûçe, gotar û lêkolîn diweşand.

Li gora biryara "Xoybûn"ê, Şêx Ebdilrehmanê Garisî rêkirin serxetê, lê mixabin ew çûn, çûna bêveger bû. Garisî Şehîd ket.

Di 24-9-1932an de, endamên civata "Xoybûn"ê komeleyek bi navê (Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê) damezirzndin.

Di havîna sala 1938an de, li gor biryara civata "Xoybûn"ê, Nadiya Ciwanên Kurd li bajarê Amûdê hate damezrandin.

Peywendî di nav "Xoybûn" û partiya Hîwa ya Îraqê de çêbûn.

Peywendiyên xwe bi Barzaniyan re nûkirin û çaxê serhildana Mele Mistefa Barzanî (1943-1945), ala Kurdî jê re rêkirin da li ser kopê çiyayên Kurdistanê bilind bike.

Di sala 1945an de "Xoybûn" û partiya Hîwa bi hev re, raporteke hevpar rêkin kongirê Sanfiran-sîsko, doza mafê Kurdan dikin.

"Xoybûn"ê nûnerê xwe Qedriyê Cemîl Paşa rêdike Mehabadê Ji bo pîrozkirina Komarê.

**Rewşenbîr û pêşewayên Rojavayê Kurdistanê yên di "Xoybûn"ê de**:

Damezrênerên Civata "Xoybûn"ê ev bûn:

1. Celadet Alî Bedir-Xan.

2. Elî Riza kurê Şêx Se'îdê Pîran.

3. Dr. Şikriyê Mihemedê Segvan.

4. Haco Axa.

5. Bozanê Şahîn beg (serokê hoza Berazan).

6. Mistefayê Şahîn Beg.

7. Emînê Ehmed (Serokê hoza Reman).

8. Memdûh Selîm.

9. Bedredîn Axayê Hebisbenê.

10. Tewfîqê Cemîl.

11. Fehmiyê Licî (nivîskarê Şêx Se'îd).

12. Mele Ehmedê Şûzî.

13. Feqe ‘Evdilayê Cizîrî.

14. Kamil efendî.

15. Kerîm efendî.

Tev endamên komîta navendî bûn pêvî (Feqe Evdilayê Cizîrî û Mele Ehmedê Şûzî).

**Kesên ko "Xoybûn" li binxetê avakirin û pêş ve birin ev bûn:**

C. Bedir-Xan, K. Bedir-Xan, Xelîl beg Bedir-Xan, Sûreya Bedir-Xan, Şêx Ebdulrehmanê Garisî, Dr. Ehmed Nafis, Dr. Nûredîn Zaza, Haco Axa, Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, Hemze Begê Muksî, Dr. Nûrî Dêrsimî, Şewket Zulfî Beg, Emîn Birûsk, Şêx Ebdilrehman û Mihemed Mihdî û Tahir birayên Şêx Se'îd, Ebdilrehmanê Eliyê Yûnis, Arif Ebas, Memdûh Selîm, Tewfîq Cemîl, Osman Sebrî, Cemîlê Seyda, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Hesen Hişyar, Cegerxwîn, Ehmedê Namî, ...û hwd.

**Lê yên ji Rojavayî Kurdistanê li gorî ko têne bîra min ev bûn:**

Mihemed 'Eliyê Şêxmûs (Şiwêş), Se'îd Axa, 'Evdê Têlo, Hacî Ebdilkerîmê Mela Sadiq, Mele 'Eliyê Topiz, Dr. Xalid Qotreş, Ûsê Hersan, Birahîmê Qiço, Isma'îlê Wethiya, Seydayê Tîrêj, Osman Alûsî, 'Eliyê Omer û hwd.

**Di "Xoybûn"ê de, rola Bedirxaniyan**:

Ji nav malbat û malmezinên Kurdan rola malbata Bedirxaniyan ya sereke bû.

Celadet Bedir-Xan yek ji damezirênerên pêşîn yên Xoybûnê bû, û hemû çavkanî û jêderên dîrokî nîşan didin ko ji sala 1927-1932-yan serokatiya Xoybûnê kiriye. Lêkolînerên wek Basîl Nikitîn, E. G. Elphinston, Erhart Franz, Nazmî Sevgen di berhemên xwe de, Celadet Bedir-Xan wek serokê Xoybûnê nîşan didin.

Berî ko "Xoybûn" belav bibe, serokê "Xoybûn"ê Dr. Ehmed Nafiz beg bûye.

Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî, digel birayê xwe Dr. Kamîran dest avêtin xebata rewşenbîrî û zimanê Kurdî, çend kovar û rojname li Sûriyê û Beyrûtê weşandin, mîna (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr) û çend pirtûkên hêja li ser ziman, tore, dîrok û folklora Kurdî çap kirin.

Xelîl beg Bedir-Xan endamê "Xoybûn"ê li Beyrûtê bû. Dr. Kamîran Bedir-Xan rêpêşendarê

"Xoybûn"ê bû. Wî radyoya Kurdî li Bêrûtê vekir û radyogêrê wê bû.

Sûreya Bedir-Xan li gorî biryara "Xoybûn"ê diçe Ewropa û Emerîkayê, û bi roleke baş di nav Kurdên penaber de radibe û alîkariyê ji nav wan dide hev, û hin şaxên "Xoybûn"ê li wir ava dike û bi hin çalakiyên diblomasî radibe. Di raporeke Îngilîz ko di dîroka 18-4-1929an de, ji Emerîkayê, ji bajarê Detroîtê hatiye şandin, dide diyarkirin ko Sureya Bedir-Xan berî ko bê Emerîkayê çûye Îtaliyayê û li wir 15 rojan maye û bi Mosolonî re hevdîtinek pêk aniye; paşê riya xwe bi Yunanistanê xistiye.

**Ji bilî sedemên şexsî, nakokî di navbera damezirênerên "Xoybûn"ê de jî hebûn.**

Nakokiyên damezirênerên "Xoybûn"ê gelek bûn. Dema xwestin ji başûr êrîşî dewleta Tirkiyê bikin, û ji şeş deveran derbasî Kurdistana bakur bibin, gelek ji wan axa û begên ko soz dabûn piştgiriya vî karî bikin û pê rabin, sozê xwe

xwarin û pê ranebûn. Evê yekê nebaweriyek di nav endamên "Xoybûn"ê de çêkir.

Piştî şikestina şoreşê valahiyek çêbû; ewê valahiyê hişt ko nakokiyên wan geştir bibin, û li hev bigrin. Hin ji endamên "Xoybûn"ê dev jê berdan û dest bi şerê hev kirin.

Tirkiyê bi hemû hêzên xwe ve gelek hewl dida ko "Xoybûn" hilweşe û ji navê rabe. Yek ji wan metodên li dijî Xoybûnê derxistina qanûnên efûyan bû. Bi saya van efûyan Tirkiyê dixwest hin endamên "Xoybûn"ê dev ji jê berdin, xwe radestî Tirkiyê bikin û "Xoybûn"ê parçe bikin. Vê yekê bandora xwe nîşan da. Wek kesên mîna Elî Riza, Emînê Perîxanê di sala 1928-an de ji "Xoybûn"ê veqetiyan, û Mehemed Şukrî Sekban jî paşê dev ji jê berda û çû xwe radestî Tirkiyê kir. Ev veqetandin û çûyînên wisa nexweş bêguman bandoreke neçê li ser "Xoybûn"ê dihişt.

Di sala 1930-î de, binketina serhildana Araratê bandoreke mezin di nav "Xoybûn"ê de nîşan da û bû sedemekî bîntengiyê. Piştî vê bûyerê "Xoybûn" qels dibe.

Tevgera serkirdayetiya "Xoybûn"ê roj bi roj lawaz dibû. Bi taybetî piştî ko "Xoybûn"ê Dr. Kamîran ji nav xwe dûrxist, birayê wî Celadet Bedir-Xan jî jiber vê yekê dev ji jê berda.

Peymana ko di nav taşnaqan û Kurdan de hatibû imzekirin, ji 19 xalan pêk dihat. Bi taybetî xala heştan ya vê peymanê gelek balkêş e. “Ji bo ko karên hevkariyê baş bimeşin, yek ji nûnerên Taşnaqan di mercin lazim de, divê têkeve nav komîta merkezî ya "Xoybûn"ê û di wir de kar bike”. Beşdarbûna kesekî din ji bo "Xoybûn"ê bûye serêşiyeke mezin. Ev yeka tê wê wateyê ko rêxistina Taşnaq rasterast tevî karên "Xoybûn"ê yên hundirîn bûye.

Hin ji endamên "Xoybûn"ê ew têkiliya bi taşnaqan re nedurist didîtin û eşkere li dij derdiketin. Li gorî baweriya wan destê Taşnaqan di "Xoybûn"ê de pir dirêj e, û sedem jî ew e ko, Kurdan li hemberî Taşnaqan xwe lawaz didîtin. Yên li dij van têkiliyan derdiketin ev bûn: Osman Sebrî, Memdûh Selîm, Şêx Ebdilrehmanê Garisî, û binemala Cemîl Paşa û hwd.

## Rola "Xoybûn"ê di dîroka Kurdistanê de

Di baweriya min de şopandina dîroka "Xoybûn"ê bihewceyî gelek nivîsandin û lêkolînan e. Ji hêlekê ve, rêçeke tev bi xwîn, kuştin, wêrankirin, mişextkirin, nepêkanîna soz û peymanan, xapandin û girêdana bi dijmin re... hwd; ji hêleke din ve, qehremanî, têkoşîn û berxwedan, dilsozî, welatperwerî û şoreş e ... hwd. Dîroka Kurdan gelek caran xwe bi xwe ber bi paş ve vegerandiye. Lê, mixabin ko gelê Kurd tu sûde ji wan serpêhatiyan wernegirtiye, û her û her di wan şaşiyên xwe de berdewam e.

Di pêşiya şoreşê de, şaşiya sereke hebbûna têkilî, xwesipartin, girêdan û pêwendiyên bi rejîmên ko Kurdistan di nav wan de parçe bûye bû.

Berî vêxistina agirê şoreşê pêwîst bû pêkhatineke giştî û amadekirineke baş û demên pêwîst helbijêrin. Mercên alîkar ji serketina şoreşê re divê peyda bibin.

Piraniya wan kesên bi avakirina "Xoybûn"ê rabûbûn ji binemalên axa, beg, şêx, mele û burjiwaziya piçûk bûn. Dema berjewendiya wan têk çû, pişta xwe dane şoreşê. Serkirdayetiya derebegî û burjiwazî û herweha ya olî jî, ji bo pêkanîna armancên neteweyî di riya serbestî û serxwebûnê de serneketin.

Biryarên şoreşê ji banî bin û ne ji binkeyeke şoreşgêrî bin, û hemû şoreşgêr di avakirina wê de ne hevpişk bin û wisa pêşkêşiya wê destikek ji girêdanên berjewendiya jor be û ji bo çewsandina cemawerê gelek ji şoreşgêran be. Gava şoreşgêr têgiha ko armanca şoreşê şoreşgêr e, û şoreş ji bo xweşiya wî û ji bo pêşketina komel xebatê dike, bê guman hingê şoreş serdikeve.

Qîrîna Mirinê ....................................................................164

## Serhildana Dêrsimê

Li Kurdistanê, ji dema Osmaniyan ve, herêma Dêrsimê herêmeke serbixwe bû. Komara Tirkiyê piştî şikestina şerê Qoçgirî, Şêx Se'îd û Agiriyê berê xwe da herêma Dêrsimê jî. Mustefa Kemal û hevalên xwe dixwestin ku, bi Dêrsimê re doza Kurdan ji binî ve ji nave rakin. Ji xwe, ji derî Dêrsimê hemahema tevayiya Kurdistana Bakur kiribû bin bandora xwe. Jiber vê jî, ji Dêrsimê re plan û fen digeriyan. Di parlementoya xwe de, qanûnên taybet ji bo Dêrsimê deranîn. Ji wan qanûnan yek jî ji herêma Dêrsimê berhevkirina çekan bû. Di sala 1936an de, dewleta Tirk , ji serokê Dêrsimê Seyid Riza dayîna çekan daxwaz kir. Seyid Riza çek nedan. Ordiya Tirk jiber vê yekê di Payîza 1936an de, dest bi haziriya şer kir.

Bi hatina demsala Zivistanê re, ordiya Tirk nikarîbû li hember Dêrsimê şer bike. Lê dewleta Tirk , weke her car tovên dubendîtî û bêbextiyê

kir navbera eşîrên Dêrsimê jî. Heta Bihara 1937an, hinek eşîr bê alî kirin, û hinek jî kişandin aliyê xwe. Ordiya Tirk di bin qumandariya General Alpdogan de, di bihara 1937-an de, ji erd û asîmên ve, Dêrsim bombebaran kir. Hukûmetê, li hêla Tirkiyê, şerê giştî diyar kir û hemû xortên 26-27-28 salî kirin esker û şandin ser Dêrsimê.

Ji Erzerom, Erzîncan û Diyarbekirê leşker anîn Elezîzê. Derûdora Dêrsimê girtin. Seyid Riza û 'Elî-Şêr serokatiya şoreşê dikirin. Şer dijwar bû. Li hember top û balafirên dijmin, gelê Dêrsimê bi qehremanî li ber xwe didan û leşkerên Tirk bêhejmar dihatin kuştin. Lê, ji derveyî Dêrsimê, ti alîkarî nedigihîşt şervanên Kurd. Ordiya Tirk dîsa dest bi lîstikên xwe yên Kevin kir. Sîxur ji Kurdan rakirin. Lawê birayê Seyid Riza, Rêber kirîn û şandin mala 'Elî-Şêr. Rêber caş, bi bêbextî 'Elî-Şêr û jina wî kuştin. Serê 'Elî-Şêr jê kir, kire tûrekî û ji qumandarê Tirk Alpdogan re bir. Hinek eşîran dev ji şer berdan. Kuştina 'Elî-Şêr di şoreşê de valahiyeke

mezin vekir. Herweha xwefiroşên din, qumandarekî Kurdan jî kuştin.

Ordiya Tirk, agir berda hemû daristan û çiyayên Dêrsimê. Seyid Riza bêhêz ket. Wî xwe bi hêzên xwe ve kişande çiyayê Munzurê û li berxwe da. Ordiya Tirk  jin, zarok, kal û pîr ne gotin wan bi hev ve girêdan û berê topan dan wan. Bombayên gazê û şewatê avêtin mal û şikeftên ku Kurdan xwe tê de veşartibûn.

Waliyê bajarê Erzincanê qasid şand ba Seyid Riza û got ku "hukûmeta Enqerê hemû daxwazên we qebûl dike. Ji bo vê yekê jî, ordiyê şer rawestandîye".

Seyid Riza, bi gotina walî bawer kir û di roja 5ê Îlona 1937an de, bi hey'eta xwe ve çû Erzîncanê. Ordiya Tirk , bi bêbextî Seyid Riza û hey'eta wî girtin û şandin bajarê Elezîzê. Di roja 18ê meha 11, 1937an de, li wir bidarve kirin. Li ber darê sêpê, Seyid Riza, bi Kurdî û bi dengekî bilind weha diqîriya:

"Ez 75 salî me. Niha şehîd dikevim. Ez dikevim nav şehîdên Kurdistanê. Dêrsim têkçû; lê Kurd û Kurdistan dê her bijîn! Ciwanên Kurd dê tola xwe bigirin! Bila bimrin zordar û derewker!".[3]

[3] -Ji pertûka "Dîroka kurd û Kurdistanê", Amed Tîgrîs û Aso Germiyanî, Stockholm, 1999, Koral.

# Serencam

Şerê Cîhanê yê Yekemîn ziyaneke mezin da rewşa aborî, gelêrî û ramyarî li dunyayê. Ji bilî kuştin û birîndarkirina mirov û xelkan, gelek kes sêwî, tawî û bê xwedî man. Ziyana herî mezin li wan welatên ko şer li ser xaka wan geriya bû, hat kirin. Çandinî, pez û dewarên wan hatin talankirin, xanî û malên wan tev wêranbûn, karxan û pîşexanên wan hatin şewitandin, serxak û binxakên wan tev talan kirin. Berî her kesî, Rûsiya  ziyaneke mezin di kuştina xelkên xwe de dît, paşî Elmaniya, Nemsa, Ferensa, Brîtaniya, Îtalya û dawî Emêrîka bû.

Piştî rawestandina Şerê Cîhanê yê Yekemîn, Ewropayê dest bi tiştên ko jê re giring û pêwîst bûn di jiyana rojane de, û ji bo avakirina welatê xwe, ji Emêrîka û Keneda kirîn. Ewropî bûn deyndarê van welatan. Bivênevên, deyndar divê deynên xwe bidin. Ji neçarî destê xwe dirêjî

zêrên xwe yên hilandî kirin, û perê wan pir pelingê wê daket. Di vê rewş û pergalê de Emêrîka, Ercentîn û Ewistralyayê bi sûde û encam biser ketin. Dibêjin: Serencama deynên Ewropayê serê sedî çel û pênc 45% ji zêrê hilandî yê dunyayê kete destê Emêrîka. Lê, dewletên ewropayî yên dagîrker û li ser serê wan Brîtaniya û Fransa, destê xwe dirêjî serxak û binxaka wan dewletên dagîrkirî kirin. Lê, pir dirêj nekir, wan dewletên dagîrkirî serxwebûna xwe xwestin.

Di warê ramyariyê de, vekişandina Ewropayê ber bi paş ve, di serkêşiya ramyariya cîhanê de diyar bû. Lê tiştê herî balkêş di serencama vî şerî de, aştiyeke kêm û nebidawîhatî diyar bû; jiber gelek sedemên bi girêk man û çareser nebûn, û hêj jî di malzaroka xwe de şerekî diwemîn hilgirtibûn.

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, cara pêşî bû ko çekên Kîmyayî, û avêtina bumban ji ezmanan

di dîrokê de tête bikaranîn. Kuştin û birîndarkirina ko di vî şerî de bûn qet kesekî nebihîstibû û ne dîtibû. Giregir û serdarên mezin yên Ewropayê hatin rûxandin. Evî şerî gelek tiştên nuh bi xwe re anîn û ser û binê cîhanê bixwe re guherand. Bi hatina şoreşa Belşevî li Rûsiya, guhertineke nuh di ramyariya Çîn û Kuba de jî kir, û hêdî hêdî rê li pêşiya şerê sar di navbera Yekîtiya Sovyêt û Emêrîka de jî dûzkir. Hêjayî gotinê ye ko, ta bi vê rojê gelek tişt jî di cîhanê de weke xwe û bê çareserî mane.

Şerê Cîhanê yê Yekemîn 1914-1918an bi bûyer û guhertinên xwe yên giring, qûnaxeke pêwîst û diyar di dîroka gelê Kurd de, pêk anî. Rewşa wî jî ne kêmtirî rewşa hemû miletên cîhanê bû. Rast e, giringiya qûnaxê ne wek dîroka gelên Ewropayê û gelê Turk bû, lê ne kêmî qûnaxa dîroka piraniya miletên Rojhelata Navîn û Xwarê bû. Serxak û binxaka Kurdistanê yek ji sedemên vêxistina Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû. Rûsiya, Brîtaniya, Elmaniya û

Fransa dixwestin cihekî xwe di nav gelê Kurd de çêkin. Her yek ji wan xwedî tewir û şêweyekî li gorî nîr, derfet û rajeya xwe bû. Rûsiya di dema şer de, û berî şer jî guh dida Ermîniya û Kurdistanê pirtirî ko guh bide parçên din ji Imperatoriya Osmanî. Ev guhdan ma ta piştî rizgariya herêmên Belqanê, jiber ko Ermînya û Kurdistan li ser sînorê Ûris bûn. Lê, Brîtaniya pir guhê wê li Kurdistana Başûr bû. Piştî serkeftina şoreşa Belşevî peymana Saykis-Bîko ya penhanî xuya bû û pê re tirsa Brîtaniya ji Ûris rabû.

Di şerê cîhanê de, gelek soz û peymanên penhanî ji aliyê dewletên mezin ve di cîhanê de hatin dan; lê mixabin, weke tavên buharê belav bûn, û tu dewlet li gotin û sozên xwe xwedî derneketin û derew kirin. Di Rojhelata Navîn û Xwarê de pir bêbawerî peyda bû.

Ji encamên Şerê Cîhanê yê Yekemîn parçe-bûna Kurdistanê bû. Ev parçebûn bandoreke nebaş li rewşa ramyarî, civakî û aborî ya netewa

Kurd kir. Bandoreke kirêt li çemekê raman, mejî û jiyana ramyariya Kurdî kir. Akamek li şêwe û awayê tevger û xebata wî ya rizgarîxwaz kir. Rewşa Kurdan dijwartir bû. Kurd di welatê xwe de bûn biyanî.

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, komkujiya Ermen koldana ser nihada mirovahiyê bû, ne tenê li bobelata şerê cîhanê bi tenê, belê ya tevaya dîroka mirovahiyê bû. belê cihê şermezarkirina nihada Ewropayê û Osmaniyan  bû. Kurd weke milet ne kuştkarê Ermenan bûn, lê hin axa û begên kurtêlxwer, nezan û paşverû bi hin karên qirêj û pîs rabûn. Lê, miletê Kurd bi tevay piştgir û pasevanê xelkên Ermen bû. Çawa mirovên xerab di nav Kurdan de rabûn, weharenge di nav miletê Ermen de jî hebûn. Herdû milet bûne qurbana lîstikeke kirêt û pir gemarî. Herdû milet bûn qurbana berjewendiya dewletên mezin di cîhanê de. Tu havil û berjewendiya Kurdan di kuştina Ermenan de nîn e, ne jî ya Ermenan di kuştina Kurdan de heye. Tenê ya giring ew bû ko

herdû milet li hemberî dijminên xwe yek bana û berjewendiya xwe ya neteweyî parastibana, emê niha xwedî du welat Ermenistan û Kurdistan bana.

Jiber Şerê Cîhanê yê Yekemîn û kuştin, talankirin û şewata gund û bajaran bi deh hezaran ji Kurdên Wan, Mûş, Erzerûm, Qers, Bedlîs û Sêrtê mişext bûn. Wan dev ji gund û bajarên xwe, mal û milkên xwe û meriv û dostên xwe berdan û berê xwe dane biyaniyê. Hinan berê xwe dane Anadolê, hinên din berê xwe dane Kurdistana başûr, û hinên dîtir jî berê xwe dane binxetê.

Di dîroka Kurdistanê de, qûnaxa penaberiyê bûyereke pir giring û pêwîst e ko mirov li ser raweste û vekole. Miletê Kurd bi dehhezaran qurbanî dane. Bûyereke dîrokî ye, ji dîroka gelê Kurd e, tijî bûyer, serpêhatî, kuştin, windabûn, jihevqetandin, dûrketin, mêranî, xizanî û perîşanî û gelek dijwarî û zehmetî bi çavên serê xwe

dîtine, lê mixabin ji aliyê dîroknivîs, ronakbîr û nivîskarên Kurd ve tu guhdan û vekolîn li ser wê qûnaxê nebûne. Ez bi hêvî me ko ev xebata me bibe cihê livandin û lêpirsîna wê qûnaxê.

Qîrîna Mirinê ........................................................................176

## Kurtejîneniîgariya Dilawerê ZENGÎ:

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistana Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Qeyser de û ji ber sedemên ramyarî yên wê demê kalkê wî (Mihemedê 'Emê) tevî malbata xwe ji gundê xwe derdikevin û berî didin binya xetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê 'Emê dimre. Lawên wî (Isma'îlê Mihemedê 'Emê û birayê xwe Mihemed) meşextî binya xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

*Dilawerê Zengî, piştî şewata Sînema Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961-ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê xwe ji xwendina pertûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir .

*Di sala 1979an de, li Amûdê bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, di wê salê de dest bi nivîsandina helbestanê dike.

*Li ber destê diyeke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Evê diyê (Ferîde Elî) akameke (bandûreke) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike. Diya wî Ferîde Elî gelek zarok ji nav agirê sînema Amûdê xelas kiriye û bi navê diya Pakrewanan tê naskirin.

*Bandûra Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe û li ser destê wî dest bi nivîsandina Kurdî dike.

*Du salan li gundê (Girê Sor) mamosteyî dike.

*Di sala 1979an de, li ber destê seydayê Tîrêj hînî nivîsandina helbestê dibe, û ji wê rojê de heta roja koçkirina seyda hevaltiya wan berdewam kiriye. Hêjayî gotinê ye ku seydayê Tîrêj navê Dilawer lê kirye.

*Di sala 1980an de ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zangoya Şamê kar dike. Piştî

heşt salan ew dûrî karê xwe dikeve. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin û lêkolîn û xebatê re vala dike.

*Di sala 1983an de, li ber destê Osman Sebrî hînî nivîsandina serbest dibe. Ji wê rojê de, li dora deh salan, têkilî di navbera wan de berdewan dibe ta ku Apê Osman ji nav me koç dike.

*Li bajarê Şamê gelek qursên fêrkirina zimanê kurdî li nav kurdên Şamê lidar dixe û bi sedan xort û keçên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dike.

*Di warê ramyarî û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye û di vî warî de gelek keda wî heye.

*Di sala 1987an de, Rewşen Bedirxan nas dike.

*Piştgiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê û yên malbata wê de kir. (Bîranînên Salih Bedir-Xan. Name bo Mustefa Kemal paşa. Mîr Bedir-Xan. Û....hwd).

*Di sala 1991ê de, piştî serîhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî girêdide.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Ji bilî nivîsandina lêkolîn û helbestan karê rojnamevaniyê jî dike. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye û dinivisîne.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yên navdar ji tîpên Erebî wergerandiye Latînî û pêşgotin ji wan re nivîsiye ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)...û du dîwanên helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî (Ji evîna çirayên kevin û li xelkê tehlê li min şêrînê). Li dora (200) pertûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê daye weşandin.

*Di sala 1985an de jin aniye. Sê kur û keçek wî hene: (Royar, Rodî, Ronî û Rewan).

*Di sala1999an de, ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di 12/7/2000an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe bajara Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. Ismaîl Beşikçî dike.

*Di sala 2004an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metran.

*Di sala 2008an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir Elfedil.

*Di sala 2011an de, careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di sala 2012an de, ji hêla komela Celadet Bedirxan ya çandeyî li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

*Di sala 2013an de, ji hêla komela Şawişka li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

* Gelek caran serdana başûrê kurdistanê kiriye û ji aliyê serokê kurdistanê Mesûd Barzan û Celal Telebanî û gelek serkirdayetiyên partî û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî li başûrê kurdistanê dihate pêşwazî kirin.

*Têkilî, danûstendin û hevaltiya wî bi van navdaran re pir xurt bû: Seydayê Tîrêj, Seydayê Cegerxwîn, helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), ronakbîrê mezin Osman Sebrî, wêjevana gewre Rewşen Bedirxan, dîrokzan Hesen Hişyarê Serdî, helbestvan Keleş, helbestvan Hamid Bedirxan, helbestvan Umerê Lelê, Zimanzan Ehmedê Palo, helbestvan Hadî Behlewî, zimanzan Rezoyê Osê, helbestvan Mihemed Elî Heso, helbestvanê hêja Ehmedê Şêx Salih.. û htd.

* Berhemên wî di warê Helbest, Çîrok, Ziman, Dîrok, Wêje, Folklor û wergerandinê de, li dora (40) pirtûkî weşandiye. Gelek pirtûkên wî destnivîs hene..

*Ji sala 2013-2020an serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyayê bû.

*Xelata Azadiyê ya Şehîd Miş'el Temo ya salên 2017-2018an, li bajarê Qamişlo wergirt.

## Berhemên min:

*Mem û Zîn, Ehmedê Xanî**, Veguhestina tîpan ji Erebî bo Kurdî; Dilawerê Zengî û Seydayê Tîrêj. Şam, 1984 (Destnivîs)e.

*Dîwana (**Pêdarî**), Helbest. Sal:1985.Şam.

***Gramêra Ziman-**Celadet Bedirxan û Rojê Lîsko -wergerandin-1990. Şam.

***Ji Mesela Kurdistanê- Celadet Bedirxan-**wergerandin-1990. Şam.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî **(Ji Evîna Çirayên Kevin**) veguhestina tîpan 1991.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Li Xelkî Tehlê li Min Şîrînê**)**-** 1991. Şam.

*Mîr Bedirxan:** Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedirxan û Dilawerê ZENGÎ. Şam.

*Alîkariya Rewşen Bedirxan kir di weşandina hin pertûkan de, ji wan:

-Bîranînên min -Salih Bedirxan-. -Name bo Mistefa kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan). -Bîranînên jinekê (perçê didiwan).

***Şerefnameya Menzûm**- Cegerxwîn- ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî, û lêveger, ravekirin û serastkirin.1997.

***Ez û Agir**- Dîwana helbestvan Hizrevan- wergerandina tîpan 1998.

***Stran, berf û baran** -helbestvan Mûeyid Teyib wergerandina tîpan.

***Bedirxanî di Cizîra Botan de-**Malmîsanij- wergerandin: Gulbuhar Bedirxan û D.ZENGÎ. 1998.

*Berî Heyv Hilê -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebî. Ji weşanên Mîdiya-Erbîl. 2001.

*Qedrî Can-Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

*Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Erebî-2001.Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

* Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî-.komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Careke din li Istanbol, weşanxaneya Pêrî, 2005- hate çapkirin.

*Dîroka Kelepûra Mîrnişîniya Botan. –Mele Xelefê Bafî.-veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Qedrî Can -Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004.

Careke din ev pertûk li çapxana Emîral, Beyrît-Libnan. 2005an de hate çapkirin

*(**Wesenun Lil'işiq**) dîwanek ji helbestan-wergerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî bo zimanê erebî. Weşandina Dar -Kîwan-Şam -2005.

*Dîwana Helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), **Zindan**, veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

*Dîwanên seydayê Tîrêj (**Xelat-1, Zozan-2 û Cûdî-3**), veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

*__Mewlûda Pêxember__ –Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral. 2006.

*__Serpêhatiyên Kurdan__-Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral.2009. Di sala 2010-an de, ev pirtûk hatiye wergerandin bo zimanê Erebî, digel nivîskar Tewfîq Huseynî -Şam.

*Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat), D. Zengî, Perçê 1-2. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

*Etyaf El-Madî, Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

*Bînahî- (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), D.Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneya Emîral.2010.

*Ebdulrezaq Bedir-Xan, wergerandina D.Zengî, Beyrût - Libnan 2010

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan**. Komkirin û veguhestin: D.Zengî. Bi herdû zimanan /Kurdî-Erebî/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010.

*Çîrokên Kurdî, Danheva: Rojê Lîsko, Wergerandin ji zimanê Kurdî: Tewfîq Huseynî û Dilawerê Zengî, Şam, 2010.

*Ji wêjeya dozê. Amadekirin û komkirina D.Zengî û Ehmed Şihab. Elmanya- Berlîn- 2011.

*****Osman Sebrî.** (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

*****Çîroka Alaya Kurdî**. Qamişlo. 2012.

*Pirtûka (**Wêjeya Kurdî- Di navbera Rastî û hêviyan de**)- Daner: D.Zengî Qamişlo, 2014-an.

*****Tedarîs El-Edeb El-Kurdî**, Wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî, Qamişlo, 2014.

*Pirtûka (**Kurd û Kurdistan**) Daner: D.Zengî. Bi zimanê erebî, Qamişlo, 2015-an.

*****Nivêjên Êzîdiyan-** Celadet Bedirxan- Veguhestina tîpan ji erebî bo latînî: D.Zengî- Qamişlo, 2017

*****Xwendina Kurdî**, Kamîran Bedirxan. Wergerandin bo zimanê erebî: D.Zengî. Qamişlo 2017

*****Rewşen Bedir-Xan**, (Jiyan û Berhem). Dilawerê Zengî, Qamişlo 2017

*__Ji Xunava Bîranînan__, (Dîtin û Hevpeyivîn), Qamişlo 2017

*__Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de__, Daner: Husên Hebeş, Wergerandin ji zimanê Kurdmancî bo zimanê Erebî: Dilawerê Zengî, weşanxana: Dar, Qamişlo, sal:2017.

*__Rewan__, (Gotar û Lêkolîn),Qamişlo 2017

*__Tabloyên Şerefnamê__, Ebdulreqîb Yûsiv Zıvıngî, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2018.

*__Destpêka edebiyeta kurdî__, Mihemed Uzun, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

*__Şerên Sasûnê__, Osman Sebrî, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

*__Qîrîna Mirinê__, Dilawerê Zengî, bi zimanê Kurdî, Qamişlo 2019

***Kurdên Çewisandî û birayên wan ên Misilman,** Cemal Nebez,Wergerandin ji zimanê

Erebê bo zimanê Kurdî: Dilawerê Zengî, Qamişlo, 2021, çapxana Pêla.

# Pêrist

-Diyarî.........................................................................3

-Pêşgotin....................................................................5

- Ewropa berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn............13

- Şerê Cîhanê yê Yekemîn...............................17

-Şerê Ewropayê ..............................................19

- Şer di sala 1915an de.....................................21

- Şer di sala 1916an de.....................................23

- Şer di sala 1917an de.....................................29

- Dawiya şerê sala 1918an...............................31

- Kongirê Aştiyê 1919an..................................33

-Peymana Firsay ...............................................37

- Avabûna Civata Miletan (Usbet El-Umem)...38

- Şerê Cîhanê yê Yekemîn û bandora wî ..........39

- Parçekirina Kurdistanê cara yekemîn............45

- Şerê Cîhanê yê Yekemîn û doza Kurdan ......49

-Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û doza Kurdan.57

Qîrîna Mirinê .............................................................191

- Peymana Sêfer-Sewrê 10/8/1920an ...............67

- Sedemên binpêkirina soz û peymanan ...........73

- Serhildana Qoçgiriyê 1920 – 1926 ................75

- Kongirê London 1921an ...............................79

- Peymana Lozan-ê 24/6/1923an ......................83

- Gelo çima Kurd nebûn xwedî dewlet?! ........91

- Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Ermen ................97

- Şerê Cîhanê yê Yekemîn û mihacirî ............129

- Serhildana Şêx Se'îdê Pîranî 1925 z .............139

- Serhildana Agiriyê .....................................143

- Komela Xoybûnê .......................................147

- Serhildana Dêrsimê ....................................165

- Serencam ..................................................169

- Kurtejînenîgariya Dilawerê ZENGÎ .............177

-Pêrist ........................................................191

Qîrîna Mirinê ..................................................192